



Danêrê Rojnameya pêşî a Kurdî
Miqdad Mûhed Bedirxan

Armanac

Hejmar, No: 125

Sibat
February 1992

Buha - Price
15 SKR, 3DM

Rojnameya Mehane

Mesûd Barzanî:

"Bi hilbijartinê emê li herêmê otorîtê bi cî bikin"



Mesûd Barzanî tevî şewirmendê xwe yê siyasî Muhsîn Dizayî li Enqerê bi berpirsiyarên Tirkîyê re rûnişt

Li ser vexwandina dewleta Tirkîyê, serokê Partiya Demokrat a Kurdistanê Iraqê (PDK-I) Mesûd Barzanî di 20'ê Sibata de çû Tirkîyê. M. Barzanî li balafirgeha Anqerê ji rojnamevanan re got ku, "em cîranên hev in û hewce-dariya me bi hev heye." Mesûd Barzanî bi serokwezîr û sorok-komare Tirkîyê re rûnişt û li ser pirsên Kurdistanê Iraqê muzakere kirin.

M. Barzanî bi dor bi Wezîrê Karûbarê Derva yê Tirkîyê Hikmet Çetîn, bi Serokê Partiya Sosyaldemokrat Halkçı Partî û cîgirê serokwezîrê Tirkîyê, Erdal İnoğlu, bi serokwezîrê Tirkîyê Süleyman Demirel û serokkomare

Tirkîyê Turgut Ozal re rûnişt. Mesûd Barzanî di rûniştên xwe yên resmî de bi berpirsiyarên dewleta Tirkîyê re li gel ku Îngilîzî zanibû bi Kurdî axaft. Ew wek serokekî dewletê bi kincên Kurdî yên milî bi berpirsiyarên dewleta Tirkîyê re rûnişt.

M. Barzanî bi berpirsiyarên Tirkîyê re li ser rewşa Kurdistanê Iraqê, li ser hilbijartina 3'ê Nisanê -ku li Kurdistanê Iraqê çêbibe-, li ser Çekîç Guç "hêza çakûç", li ser parastina sînorê Tirkîyê û Iraqê sekinî. Wî daxwaza alîkariya aborî û tîbbî dubare kir. Barzanî li ser hilbijartinên 3'ê Nisanê got ku; "Piştî ku Saddam merivên xwe yên îdarî ji Bakûrê

Kurdistanê vekîşandin li herêmê valayîyeke otortîte çêbû, em dixwazin bi hilbijartinê valayîyê tijê bikin. Yanî hedefa me ne serxwebûn e, em dixwazin pirs û pîrgêrêkên xwe yên hundîrîn çareser bikin."

Mesûd Barzanî piştî seredana xwe ya bi berpirsiyarên Tirkîyê re civîneke çapemenî çêkir. Di civînê de li ser rewşa Kurdistanê Bakûr û muzakerên xwe yên bi berpirsiyarên dewletê re agahdarî da.

Dûmahik: r.11

Komîta Hewldana Maf û Azadiyên Kurdan

"Pirsa Kurdî bes bi metodekê çareser nabe"

Komîta Hewldana Maf û Azadiyên Kurdan bi beşdarbûna 185 ronakbîran di 23'ê Sibata de li Stenbolê civiya. Di dawiya civînê de beyanek ji raya giştî re hat weşandin.

Beyan bi kurtî wiha ye;

Netewê Kurd bi nufûsa xwe ya 30 milyon li Rojhilata Navîn yek ji wan gelên herî kevintir, bi nufûsa xwe herî mezintir e û di eynî wextê de gelê herî mazlûm û maxdûr e. Îro pirsê Kurdî, li gel pirsê neteweyî di eynî wextê de pirsê navnetewî

ye jî. Heta ku ji çareserkirina pirsê Kurdî re riyên aşî û demokratîk neyên dîtin, ne li Tirkîyê ne jî li Rojhilata Navîn aramî bi cî nabe. Di qonaxa îro de çareserkirina pirsê Kurdî eşkere ye ku bes bi metodekê û bi riyekê nabe. Di vê riyê de hemû metod û riyên ku gelê me bi kar tîne meşrû ne. Wek hemû pirsên netewî, divê pirsê netewê Kurd jî di çerçewa mafê çarenûsî de bê helkirin. Di eslê xwe de çareserkirina qedera netewê Kurd, hebûna xwe ji meşrûtiyeta dîrokî û civakî digre û

ev mafê bingehîn bi peymanên netewî û peymanên ku Komara Dewleta Tirkîyê jî re aliyê, hatiye stendin. Divê ku ev maf, bê qeyd û bê şert bê naskirin. Pirsê Kurdî, dikare li ser bingeha maf û azadiyên netewî û demokratîk çareser bibe.

Îro gelê Kurd rûbirûyî şerekî ku dewletên kolonyalist bi zorê spartine wî, hatiye hiştin. Eger bi rastî armanc ew e ku çareserkirina pirsê Kurdî bi riyên demokratîk û aşî hel bibe, divê berî her tiştî di demê kurt de ev şerê neheq bê rawestandî.

Dawiya terora dewletê nayê

Qetliamên Hîzbollah-Kontra bêtir dom dîkin. Di van demên dawiyê de li Kurdistanê cîayetên qatîlên wan nenasin ji 60'î buhurîn. Di nav van rojên dawiyê de li herêma Diyarbekrê û Mêrdînê 5 kes hatin kuştin, ku ji vana du kes rojnamevan bûn: Halit Gungen û Cengîz Altûn.

Halit Gungen muxabîrê kovara hefteyî 2000'e Dogru-(Berbi 2000'i)- di roja 18'ê Sibata de li Diyarbekrê li buroya kovarê hat kuştin. Di 22'ê Sibata de cenazê wî li Şernexê ji alî qelebalixek mezin ve hat veşartin.

Cengîz Altûn, muxabîrê rojnameya Yeni Ulke bû. Cengîz Altûn li Batmanê roja 24'ê mehê seet li dora 9.00 gava diçû karê xwe li ber camiya Hecî Şîrîn ji alî sê kesan ve hate gullebarankirin. Cenazê Cengîz Altûn li Batmanê ji alî 25 hezar kesî ve bi

rengê meşeke protestoya li dijî êrişên Hîzbollah-Kontra hat veşartin.

Cîayetek din jî di 27'ê Sibata de, li Farqînê, qetilkirina Şehmûs Akinci bû. Şehmûs Akinci ji Nusêbînê bû. Ew, Nusêbîniyê 7'an bû ku ji alî Hîzbollah, ya jî bi navê ku xelk dibêje, Hizbul-Kontra hat kuştin.

Di hejmara berê de jî em bi dîr û dirêjayî li ser van cîayetên Kontr-gerilla û Hîzbollahê sekinîbûn. Tiştê diyar ew e ku tiliya hêzên dewletê jî di van cîayetên de heye, lema jî qatîlên cîayetên nayên dîtin. Bila dîtina qatîlan li wir bimîne, dewlet bi xwe terorek fiilî û psîkolojîk dimeşîne û ji bo êrişê dixwaze kaosekê peyda bike.

Dûmahik: r.11

S. Réving

"Divê em xwe ji alfabetîzebûna Tirkî xelas bikin"

Rûpel: 6-7

Di Şeva Bîranîna Komara Mehabadê de sextekarî

Ji aliyê Hevkariya Hêzên Siyasî yên Kurdistanê li Swêdê ve û Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê di 22'ê Sibata de li Stokholmê li Solna Hallenê şeva bîranîna avabûna 46 saliya Komara Kurd a Mehabadê hat çêkirin. Nêzî 1300 kesî beşdarî şevê bûn. Dengbêj û komên



muzîkê yên ku beşdarî şevê bû ev in; Birîndar, Erdelan, Hevraz, Şevger, Grûba Naz, Folklor a Grûba Muzîka Kurd li Spongayê, Grûba Zîryab, Fexredîn Gerdî, Mistafa Dadar, Cûdî, Nasir Rezazî û Seîd Gabarî.

Li gor amadekarên şevê, hin kes yan jî kesan biletên şevê bi fotokopiyê zêde kirine û li dora 300 hebî firotine. 1300 (Ji bilî hunermend, sazband, grûbên muzîkê û kesên di şevê de kar kirin) kes beşdarî şevê bûne lê biletên ku ji aliyê komîta şevê ve hatine firotin nêzî 800 hebî ne.

Ev cara pêşî ye ku li Swêdê sextekariyeke wiha dibe.

Rojeva Mehê

Di dijminatiya li hember biyaniyan de rola me biyaniyan

Piştî êrîşên ser biyaniyan munaqeseyek mezin li ser nijadperestî û dijminatiya li hember xerîban di civaka Swêdî de dest pê kir. Swêdî bi hukumet û parlamentoya xwe, bi partiyên siyasî, dezgehên civakî, çapemenî, radyo û televîzyonên xwe û wek şexs tevî van munaqesên dibin, her yek li gora xwe sedem û encamên nijadperestiyê, dijminatiya li hember biyaniyan û êrîşa li ser wan radiweste, fikrên xwe diyar dike, rê û dirban pêşniyar dike.

Lê gelo biyanî bi xwe çiqasî li ser vê rewşa han mejîyê xwe diwestinîn, çiqasî berê xwe didin lêkolîn û munaqesê û xebatên zanistî û bi taybetî çiqasî li ser wê yekê difikirin ku rola wan di nav van sedeman de xwedî pareke çiqas, û ev sedemên ku ji rewş û rola wan tên çî ne, çawa dikarin bî çareserkerin?

Helbet meriv nikare zêde li ser muhawele û tevdira hemû biyaniyan çarçeweyek zelal a eşkerekirî derxe meydana, lê gava em wek biyaniyên Kurd li xwe binêrin, eşkere ye ku wê zimanê meriv negere ku meriv bêje di vî warî de em karekî îlmî yê ciddî dikin.

Yê xwiya ew e ku zêdetir em di rehawetekê de ne, bi giranî em meselê bi nijadperestî û geşbûna nijadperestiyê ve girê didin û bêtî ku serê xwe bêtînin em her tiştî davêjin hustuyê Swêdiyan û bi erzanî û rehetî xwe ji meselê dûr dixin.

Lê rêveçûnek wiha derdê meriv çareser nake û rê li jiyaneke hêsa û bextewartir venake. Erê nijadperestî ideolojiyek wiha ye ku ji rûmet û pîvanên insaniyê bêpar e û bi rehetî berê xwe dide jiyana insan, kuştinê jî û her tiştên xerab ên dîtir jî dike. Lê xwiya ye sedemê mîrkujî, xwînrejî, êrîşkariyê ne bes nijadperestî ye. Eger wiha bûya gelek hêsa bû, nijadperest di civakê de ne ewende pirr û xurt in, bi tedbirên ta dereceyekê sivik jî rê li ber wan kare bêtî girtin. Lê tiştê ku ji wê berfirehtir û bi bingehitir û bi tesîrtir ew e ku nerazîbûn, nehezkirin û dijminatiyek li hember biyaniyan heye. Yan jî bi peyvek hîn rasttir, nelihevkerinek berfireh di navbera biyanî û Swêdiyan de heye ku ev jî ji nasnekirin û lihevnekirina kulturên cihê tê. A ya giring ev e ku hem berfireh û xwedî rehên kûr e, dûrûdirêj dajo zûbizû çareser nabe û hem xwînê dide êrîşên nijadperestî hem jî gelek êrîş, êş û sergêjaniyên ne nijadperest jî jê peyda dibin. Ev çêreya gelek êş û derdan e.

Gava meriv bi vî çavî lê binêre wê xwiya bibe ku di peyda bûna vî lihevnekirina kulturî de hem rola Swêdiyan hem jî ya me biyaniyan heye.

Berî her tiştî yek jê ew e ku ne bi îrade û qesta herdu alîyan, ji ber ku kulturên cihê yê hevnehas pîrgiyî hev tînin tebîî lihevnekirinek peyda dibe. Tiştin hene li nik me hin biyaniyan şerm û ar in lê li cem Swêdiyan tebîî ne, heta nişanên serkevtin û şanaziyê ne. Hin tişt hene gava em dibihizin ya dibînin em dikarin pê bikenin û kêfxweş bibin, lê ew pê xemgîn yan hêrs dibin. Bi hezaran cudatîyên wiha dikarin bî jîmartin.

Lê aliyekî din ê meselê jî ew e ku agahdarkirin û nasîna hev û din di vî warî de di destê me de ye. Gava çiqas meriv hev û din û kultura hev nas bike, sedemê, têkilî, rewş û reaksiyonên xwe yê cihê cihê bi hev bide zanîn, lihevkerin ew qas kêm dibe, pêre jî nêzîkbûn û têkilî ewqas rehetir di-kare di civakê de rû bidin.

Divê em jîbîr nekin, nijadperestî û taybetî dijminatiya li hember biyaniyan ne bûyerek demane ye ku ji nişka ve peyda bûye û di demek kurt de jî wê rabe. Na, wiha zûbizû ev mesele ranabe. Çimkî dinya me ya îro bûye dinyayê wilo ku, mîlet û gelên cihanê jî qalik û çarçewa xwe ya mîlî yan ya welêt derdikevin. Îlim û teknîkê îmkaniyek wiha peyde kiriye ku çûn û hatin û peywendîya mîletan gurr û geş bûye. Li ser ruyê erdê insan bûne wek kurmoriyên ku li derûdora moristankê bêtî rawestan diçin û tînin. Ev rê vebûye, nema têtî girtin, pêlên lehiya insanên wê geh bi vî quncikê dinyayê geh jî bi wî quncikê dinyayê de biçin û bînin. Hesab û plan divê li gor vê bêtî kirin.

Gava rastî ev be, eşkera ye ku wek biyanî û wek Kurd di vî meselê de gelek tişt dikevin ser hustuyê me jî. Em jî edî divê xwe tîxin rewşek wiha ku xwe bi kultura xwe, ruh û karakterê xwe bi yê din bidin nasîn, bibînin ka em bi vî hebûna xwe dikarin çî tîxin ser jiyana û kultura mîletên din, û wan nas bikin û fam bikin.

Eger em rastiyê bêtî di vî warî de yê herî kêm tiştî kirine yek jê jî em Kurd bi xwe ne. Ji xwe xelk me nas nake, nasîna ku heye jî bi mezlûmbûn û bîndestbûna me ve sinorkirî ye. Em bes gunehê xelkê bi perîşanî, nezani û belengaziya xwe tînin, em nafikirin ka ku em ji xwe çî karin bidin vî cihanê, bi çiyên xwe yê qenc dikarin bibin şîrikê medeniyeta vî cihanê û bi vî awayî jî xwe bi xelkê bidin nasîn.

Ji bo ku meriv karibe xwe bi xelkê bide nasîn û famkirin û wan nas û fam bike berî her tiştî divê meriv xwe baş nas û fam bike. A xerab ew e ku em hê di vî warî de di dereca nêzî sifirê de ne.

Ji bo numûnedana di vî warî de qet ne hewce ye em zêde kûr û dûr he-rin, em dikarin ji civaka xwe ya Kurdan a li Swêdê dest pê bikin. Ka em bî-fikirin, civakek Kurd a ji 15 hezaran zêdetir heye ku li Swêdê dijî. Em tek û tûkên xwe yê kevnare nexin hesêb tarîxek me ya 20-30 salan li vir heye. Gelo heya nuha me çend lêkolîn, li ser tarîxa xwe ya li Swêdî li ser jiyana xwe, derd û êş û kêf şayîyên li ser lihevkerinên xwe yê bi kultura Swêdiyan û encamên wê, li ser xebatên xwe yê civakî û kulturî û ekonomîk û li ser rola xwe ya di civaka Swêdî de kirine. Ka gelo arşîvek me li ser tarîx û jiyana me ya Swêdî bi dokument û tekst û risim û film heye? Ma gelo em nikarin di van waran de îdî gavan bavêjin. Ma dezgeh û îmkân û alim û lêkolînerên me yê jî bo vî yekê tune ne. Ma federasyona me, komela nivîskarên me, ya doktoran û komele û dezgehên me nikarin heryek jî alî xwe ve xwe tîxin bin vî barî?

Eger em bêtî na, wê ne rast be. Çimkî em dikarin gelek tiştan bikin û divê em bikin jî.

Swêd: Li dijî dijminatiya biyaniyan tevgerêke xurt

Roja 21'ê Sibatê seet di 10'an de ji bakurê Swêdê bigre heta başûrê wê hemû trafik(metro, tren, otobus) 5 deqîqan sekinîn, li gelek fabrika karkiran dev ji kar berdan, xwendevanên dibistan û zanîngehan ji dersan derketin, zarokên zarokxanan(kreş) li baxçên zarokxanan civiyan, hemû dêran zengilên xwe lëxistin, esnafan dikanên xwe girtin. Vê rojê meş û mîting organîze bûn, li ser rasîz-mê, û dijminatiya biyaniyan axaftin çêbûn. Bi vî rengî dijminatiya biyaniyan û êrîşên rasîstan li Swêdê bi tevgerêke xurt li her ciyê Swêdê hat protestokirin.

Ev tevgera xurt ya li dijî rasîzmê û dijminatiya biyaniyan bi însiyatîfa **Federasyona Komelên Kurdistanê** li Swêdê ji komelên biyaniyan re hatibû pêşniyarkirin. Tevger ji aliyê komelên biyaniyan ve hat organîzekirin û gelek partiyên siyasî yê Swêdê û hînek sendîka, dezgeh û mûesesen Swêdî piştigirî ya vî tevgerê kirin.

Li Swêdê di mehên dawî de rasîst bombeyan dixin istasiyonan, êrîşî biyaniyan dikin û heta nuha nêzî 10 kesî bîrîndar kirin yekî Îranî jî kuştine.

Swêd

Kongra Federasyonê

Di rojên 22/23-02-1992'an de kongra 12'mîn ya Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê bi beşdariya 154 nûnerên 42 komelên endam, ci-viya.

Ji bilî nûneran, gelek mîevanên ji dezgehên cûr bi cûr yê Swêdî, nûnerên federasyonên biyaniyan û kesên Kurd jî hatibûn kongrê. Serkêşî û beşdariya Fedrasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê di kar û aktivîteyên li hember dijminatiya biyaniyan li Swêdê, ji aliyê mîevan û nûnerên kongrê ve hat pesindan. Gelek nûneran jî rexne li Komîta Giştî û Komîta Karger girtin ku cara yekem Federasyon bi-deyndarî kongra xwe dicivîne. Di kongra îsal de bi guhertina bendeke destûra Federasyonê rê li ber ciwan û jinên Kurd hat vekirin ku bikarin ji salên buhûrî pirtir beşdarî kongreyan bibin. Li gor guhertina

destûrê "...komelayên ku xwedî seksiyonên ciwanan û seksiyonên jinan hene, wê ji bo 15 kesên pêşî yê endamên xwe sê nûneran bişînin kongrê ku ji wan yek wê ji seksiyona ciwanan û yek jî ji seksiyona jinan be". Kongra 12' mîn ya Federasyonê piştigirî ya xwe ji bo hilbijartinên li Kurdistanê başûr xuya kir û biryar da ku 3 kes li ser navê Federasyonê biçin Kurdistanê başûr. Her weha dijminatiya li hember biyaniyan hat protestokirin, biryar hat dayîn ku ji serokwezîrê Swêdê Carl Bildt re nameyek bêtî şandin ku li hember vî yekê tedbirê baştir bêtî girtin. Di kongreya Federasyonê de **Vildan Tanrikulu (Serok), Ahmet Karamus, Ebdulrezaq Feylî, Mahmut Kiper, Cemal Batun, Xusro Goran, Xebat Arif** jî bo Komîta Karger ya nû hatin hilbijartin.

Kongreya 4'mîn ya PDK-T

Kongreya 4'mîn ya Partiya Demokrat a Kurdistanê Tirkîyê di dawîya meha 11'an ya sala 1991'an de civiya. Yek ji biryarên Kongrê ew bû ku parti îbareya Tirkîyê jî navê xwe derxist û navê xwe kir Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK)

Kongra Yekîtiya Nîştîman

Kongra Yekîtiya Nîştîmanî Kurdistan di 27'ê meha Çileyê Paşîn de li salona Rewşenbîrî li bajarê Silêmaniyê civiya. Di kongrê de 793 nûner û 72 çavdêr amade bûn.

Kongre roja 29'ê Çileyê Paşîn, ji ber wefata Omer Debabe 3 rojan rawestiya. Dûre di 2'yê Sibatê de li salona Mîdya li bajarê Hewlêr dest bi kar û barê xwe kir.

Yekkirina her sê rêxistinên ku YNK damezirandibûn biryarên kongrê yê herî giring, ku ew jî Komela, Yekîtiya Şoreşgeran û Hêlî Giştî bûn. Bi vî biryarê YNK bû yek rêxistin.

Program û destûra YNK li gor bîr û baweriya Sosyal Demokrat hat hazîrkirin û qebûl-kirin. Roja dawiyê, kongrê serkirdayetiya xwe hilbijart. Serkir-da-yetî jî 17 kesên pêk têtî 6 kes jî wek cîgir hatin hilbijartin. **Celal Talabani ji bo Sekreteriya Giştî, Noşîrvan, Dr. Fuad Mahsum, Omer Seîd Alî, Erselan û Kusret** jî wek endamên Komîta Merkezî hatin hilbijartin.

Bi damezrandina xwe heta nuha ev cara yekem e ku Yekîti kongra xwe çêdike.

Bisporên Rûs hîn jî alîkariya Iraqê dikin

Ji Sovyeta kevin zêdeyî 50 bisporên enerjîya atomî li Iraqê dixebitin. Ev îddîa ji alî du ekspertên ku di nav wê grûbê de ne di rojnameyêke Almanî de hat diyarkirin.

Gava balafira Jegor Belousov, ekspertê laserê û Viktor Bakunîn, ekspertê çekan diçû Iraqê li Berlînê danî û rojnama "Dresden Morgenpost" bi wan re hevpeyvînek çêkir. Van her du ekspertan di vî hevpeyvînê de ev yek eşkere kirin. Wan got ku ew diçin "komplekseke eskerî" ku nêzî Bexdayê ye. Li gor agahdariyên wan, wan bi hukûmeta Bexdayê re peymanek ji bo 5 salan û mehê 10.000 dolar meaşîmze kirine. Meaşê wan li Rûsyayê mehê 50 dolar bûye.

Herduyan jî gotin:
-Em pirr hêvî dikin ku emê karibin di beşê ku em têtî de spe-sialîst in xebata xwe bidomînin.

Wek têtî zanîn berî têtîkûna Sovyetê jî gelek ekspertên Sov-yetî jî bo çekirina çekên kîmyayî û enerjîya atomî alîkariya Iraqê kiribûn.

Armanç
Rojname Kurdî ya mehane
Monthly Kurdish Magazine
Redaksiyon:
M. Elî
Zinarê Xamo
Hesen Mizgîn
Mîrza Bextiyar
Lewend Firat
S. Rêving
M. Lewendî
Redaktorê berpirsyar:
M. Elî
Berpirsiyarê beşê Dimilki: Malmîsanîj

Adres :
Box: 152 16
161 15 Bromma
Sweden
Telefon
46-8-803135
Telefax:
46-8-801825
Ansvarigutgivare:
Kurdîska
Demokratîska
Arbetar Unionen
Postgiro: 50 37 99-9
ISSN: 0348 7385

Aboneti
Prenumeration
Abonetiya Salekê
Li Skandinaviya
150 SKR
Maqam
Myndigheter
250 SKR
Li Ewropayê
50 DM
Li derveyî Ewropayê
40 \$
Anons/ilan
niv rûpel/ en halvsidan
2500 SKR

Norweç


Ji Kurdan re sol û kinc

Li Norweçê li bajarê Stavan-gerê 3 kesên Norweçî; Geir Melby, Tom Heradstueit û Jan Inge Reilstad ji bo Kurdên Kurdistana Iraqê kampanya topkirina sol û kincan vekirin. Ji van sê kesan Geir Melby li ser fikra kampanya topkirina sol û kincan wiha dibêje; "Gelê Kurd bê dewlet e, trajediya gelê Kurd a dawiyê em teşwîk kirin ku em vê kampanyayê vekin. Kampanya me hefteyekê ajot û xelkê alaqeyek mezin nîşan da. Me texmîn dikir ku emê di hefteyekê de ancax kamyonek sol û kinc berev bikin, lê texmîna me xelet derket û me tam 4 kamyon kinc û sol berev kir. Xelk ji bo alîkariyê bi seatan di dorê de sekinî û Ji bo kirêkirina kamyonan û şandina van sol û kincan, me ji belêdiyê û ji hin muesesan pere jî top kir."

Di 20'ê Sibatê de bi alîkariya Kurdan sol û kinc gihîştin Diyarbekirê.

Li Osloyê kampanyeke bi vî şeklî hîn dom dike. Ji aliyê din îsal hatina pîrozkirina Newrozê ya Stavangerê ku ji aliyê KKDK ve di 10'ê Nisanê de tê pîrozkirin, wê ji Kurdistana başûr re bê şandin.

Firat Dogan/Norweç



Geir Melby: "Gelê Kurd bê dewlet e, trajediya gelê Kurd a dawiyê em teşwîk kirin ku em vê kampanyayê vekin"

Li Moskovayê sê rojên çanda Kurdî

Ji 31'ê meha Kanûna Paşî heya 2'ê meha Sibata sala 1992'an rojên çanda Kurdî li dar ketin. Bi xwe qezanca şevan ji bo piştigiriya sê rojnamên Kurdî bûn; 1- **Armanç (Stockholm)**, 2-**Riya Teze (Erîvan)**, 3-**Kurdistana (Alma-Ata)**. Mixabin hatinê şevan pir hindik bûn. Lê Kurd sê rojan hatin nik hev û li ser dîrok û çanda xwe lêkolînên heja bihîştin û li ser wan munaqêşe kirin.

Bi xwe bernama roja pêşî, li ser dîroka Kurdan bû. Di vî warî de Prof. Lazarev bi navê Beşê Kurdî li Enstîtuya Rojhilatnasyîyê, pîrozbahiyên xwe pêşkêşî Kurdan kir û dî re li ser perspektîva pîrsa Kurdî di qonaxa îro de, axaft.

Li pey wî Prof. M. Hasretyan li ser tema "Kurd di destûra Tirkan de" peyivî. Herçî O. Jigalîna, lêkolîna wê li ser dîroka Kurdan Asayê, li Sovyetê bû. Û Dr. S. Asiryan li ser pîrsa "Xwenaskirina Netewî" gotina xwe pêşkêş kir.

Piştî axaftina alimên dîroknas, munaqêşeyek fireh li ser rewşa Kurdistana vebû.

Di vî navê de, rejîsorê Kurd Mustefa Emo filmê xwe yê bi navê "Gola Gemarî ya Bîstan" ku ji ber naveroka çîroka A. Çexov "Oda Şeşan" hatibû stendin, pêşkêşî temaşegeran kir. Vî filmî bala gelek kesan kişand ser xwe, çimkî rejîsorê me bi awakî nûjen tema Çexov rave kir û da nasîn. Helbet ev gava han li gora temenê rejîsorê Kurd ku di

vî warî de hîn nûh in hindik e.

Roja Duyem li ser ziman û literatur û çanda Kurdî bû; şairê me yê bi nav û deng Ebdullah Peşew li ser tecrûba xwe ya helbestvanî peyivî û çend helbestên xwe jî xwendin.

Doktor Celîlê Celîl, bi fi-rehî li ser Sofizma di qewlên şêxên Yezidiyan de peyivî. Herçî deklada Dr. Beşîr Sebrî li ser "Xanî û Serdema me" bû. Çerkesê Reş jî li ser lêkolînên biyaniyan li ser Kurdan gotina xwe got.

Di eynî rojê de, Bêkesê Telo filmê diploma xwe pêşkêşî şevê kir. Ew jî li ser jiyana şairê me yê nemir Cegerxwîn bû.

Roja siyem jî, tiyatroya Kurdan ya li Gurcistanê, piyasa xwe bi navê "Xwesû" pêşkêşî Kurdan kir. Ev piyase komedî bû û bi

lîstika artistên me hemûyên temaşavanan di hundirê seet û nîvêkê jî kena zik bûn.

Rejîsorê piyase Mûrad Cafer bû û hunermendê wê Gundî bû. Li gora nêrîna kesên hazir, şanoya(piyase) me pirr serketî bû û bi saya wê roja çanda Kurdî pê hate xemilandin.

Herçî awaz û dengên hunermendên me Şepal û Stêr, wek olanê li salonê li hev vedigeriyan û hîştin ku xelk rabin ser nigan û dîlanê bikin.

Di dawiya şevê de, qura loto hate kişandin û xwendevanê Fakulta Rojnamevaniyê li Unîversîta Moskovayê xelata yekem (10 hezar) otomobîl girt. Û bi vî yekê rojên çanda Kurdî li Moskovayê bi xweşî çûne serî.

Bavê Nazê/ Moskova

Kurdistana zivistanek giran dijî

Aşîte 189 can stendin

Îsal zivistanek giran bi ser welatê me de hat. Di meha Çileyê Paşî û Sibatê de li gelek herêman qalindiye berfê jî mîtrokê buhurî; heta li hin herêman gihîşt 5 mîtroiyî. Gelek riyên bajaran bi rojan girtî man. Di destpêka meha Sibatê de li Kurdistana Bakur riyên 5575 gundan hatin girtin. Bi vî xezaba zivistanê re buhayê êzinga jî du sê qat buhatir bû.

Li gor reqemên resmî di van her du mehên dawî de 189 kes di bin aşîte de man û mirin. Di roja 1'ê Sibatê de bes li gundê Şernexê Gormeqê 62'yê wê esker 88 kes di bin aşîte de man û mirin. Ji zû ve ye ku zivistanek weha giran li Kurdistana nehatibû dîtin.

NEYNİK

Li hember çewtiyan divê pîvan çi be?

Behram ARDA

Li Kurdistana şîyarbûna netewî roj bi roj xurttir dibe. Meseleya Kurd û Kurdistana di warê navnetewî de hîn zêde aktuel bûye. Ji alî dewletên Rojhilata Navîn û hin dewletên din ku hesabên wan li ser mintiqê hene, bi awakî resmî neyê gotin jî meseleya Kurd û Kurdistana, hîn vekirî xwe nîşan dide ku pîrsigirekek esasî a mintiqê ye.

Ev tiştên han, ji başûr heta bakur, ji rojhilat heta rojavayê welatê me, yanî tevayî Kurdistana elaqeder dikin. Wexta ku em bi mesûliyetî li rastîya millet û welatê xwe binêrin, emê baş bibînin ku li gel hin plan û leystikên dijminên gelê me, gelek îmkân jî hene ku meriv dikane wan ji bo serxwebûn û azadîyê û mafên netewî yên din bi kar bîne.

Di qonaxa îroyin de divê em ji do hîn bêtir hay ji hesabên dewletên kolonyalist hebe û hîn zêde ehemîyetê bidin yekîtiya partî, rêxistin û şexsên sosyalist, şoreşger û welatperwerên Kurdistana. Seddamê xwînrij dixwaze him Kurdên Kurdistana Başûr bîne hember hev him jî dixwaze hêzên Kurdistana Bakur û Kurdistana başûr bera hev bide. Dewleta Tirk jî bi her awayî dixwaze û dixebite ku hêzên Kurdistana şerê hevdu bikin. Li ser Kurdistana Bakur jî gelek plan û leystikên dewleta Tirk hene. Hukûmata DYP-SHP jî alîkî ve dibê "em realîteya Kurdan nasdikin", lê alî din jî wek tê zanîn şerê qirêjî ku bi salene li Kurdistana dajo, bi hin metod û haziriyên nû ve firehtir dike.

Divê em sosyalist, şoreşger û welatperwerên Kurdistana neyên xapandin û tiştê ku feydeyê wî digihîje dijmin nekin. Çi li tevayîya Kurdistana çî li perçeyên Kurdistana, wexta ku em nikarin di cehpe yan jî di platformeke din de werin ba hev, divê em dijminatîya hevûdu nekin.

Ji bo têkoşînê gelek wasite (navgîn) hene: Partî, rêxistin, komîte, komel, kovar, rojname û hwd. Ji alî metodên têkoşînê jî di navbera partî, rêxistin û şexsa de hinek ferqiyet hene û wê hebin. Her teref gor bîr û bawerîya xwe, bi wasite û metodên cihê têkoşînê dide. Di bikaranîna van wasite û metodan de jî bê şik çewtî û kêmasiyên hêz û şexsan hene û wê hebin. Divê rexneyên me yên li çewtî û kêmasiyên muxalefeta netewî jî di çerçeweya dostanî û biratiyê de bin.

Wexta ku em bi vî perspektîfê li meselê binerîn, hin xeteriyên ku îro roj di nav muxalefeta netewî a Kurdistana de hene, xwanê dikin. Hin partî, rêxistin û şexs mumkun e hin wasite û metodan li gor bîr û bawerîya xwe baştir dixebitînin. Lê ew "baş"î divê nebe sebebê pozbîlîndîyê û çêra. Ya din jî, carna "baş"î û "nebaş"î li gor wext, cî û terefan tê guhertin. Di dîroka Kurdistana de di vî warî de gelek mînakên baş hene.

Wek mîsal meriv dikane xebitandina hinek îmkânên legal li Tirkîyê û li Kurdistana bakur bide. Di warê legal de ji bo xizmeta tevgera netewî xebitandina komel, hîlbijartin, rojname û kovaran tiştên ku jîyanê nîşan dan gelek balkêş in. Yên ku di vî warî de gelek rexneyên giran dianîn, îro ji bo ku îmkânên legal bixebitînin her tiştî dikin û bi awakî "hostetî", ji hemû alîyan ve "mîlad"ê ji xwe didin destpêkirin.

Dîroka berxwedanê, xebitandina îmkânên legal, şerê çekdarî, di warê herî xirab de şexsiyeta netewî parastin, ji bo idealên paqij xwe fedakirin, ne ji 1925'an ne ji 1969'an ne ji 1975'an ne ji 1984'an dest pê kirine. Di rewşa îroyîn de xwedî hêzbûyîna divê nebe sebebê înkarkirina rastîyên dirokî û nexweşîya "di her tiştî de dirokê ji min dest pê kiriyê".

Di nav muxalefeta netewî a Kurdan de hin nexweşiyên din jî hene. Ji bo hinek tiştên biçûk pesnê dewletên qolonyalistan dayin, ji alî perspektîfên stratejîkî û taktîkî paşde gav avêtin û bi navê "yekîtiya netewî", "çima kovar, rojname û partiyên me nabin yek" jî hin meylên çewt yên dinin. Ev meylên çewt jî divê werin munaqêşe kirin.

Divê em bibînin ku îro gelek fersend hene. Em çewtî û kêmasiyên munaqêşe bikin û bi awakî dostanî û biratî dîtinên xwe biparêzin. Lê divê em ji do heta îro li Kurdistana fatûraya şerê birakujî û dijminatîya ku hêzên welatperwer sebeb bûne, baş bibînin û nebin sebebê fatûrayeke nû. Ne Kurdistana ne jî gelê Kurd di rewşa berê da ye û Kurdistana ji bo xebata me ya sosyalist, şoreşger û welatperweran vekirîye û ji me gişan re bes e. Tiştê ku em îro muhtac in şîyarbûn û xebat e. Em bi çî bawer dikin, divê em di wî warî de xebatê geş bikin. Lê ya muhîm ev e ku, hêz yan jî şexs, hindik yan zêde, lê bi xebata xwe xizmeta doza gelê Kurd û Kurdistana dike yan na? Pîvan divê ev be.

RAMANÊN RAMANWERAN

"Rêwîtiya Hêviyê" ya Mirinê ye

Şahînê B. Soreklî

Di sinemeyeke bajarê Sydney de filimekî bi navê THE JOURNEY OF HOPE (Rêwîtiya Hêviyê) hat nîşandan. Filîm bi piranî bi zimanê Tirkî ye û ew ji hêla nivîskar û rejîsorê Swîsî **Xavier Koller** ve (bi alîkariya Feride Çiçekoglu) hatiye çêkirin (Navê filîm yê Almanî (REISE DER HOFFNUNG) e.

Bingehe filîm serpêhatiya trajîk a malbateke Kurd e. Ev serpêhatî bi rastî jî di sala 1988'an de qewimîye. Filîm serpêhatiyê wisa diyar dike: Gundiyekî ji dorhêla Mereşê, ku di filîm de navê wî Heyder e (Necmettin Çobanoglu) tevî jina xwe Meryemê (Nur Surer) û bi lawekî xwe re berên xwe didin Swîsrayê. Kurmamekî wî di nameya xwe de Swîsrê wek bihuştê dide nasîn û Heyder jî dixwaze biçe vê bihuştê. Ew, zevî û dewarên xwe difroşe, 6 zaroyên xwe, gundî û meriyên xwe li pê xwe dihêle û berê xwe dide Stenbolê. Ji wir û şûn ve ew dikeve nav destên guran, kesên bêwûjdan.

Piştî dijwarî û rezaletiyê mezî bazirganên jiyana mirovan, Heyder, jina wî, lawê wan û çend kesên din li Milanoyê (Italya) digihînin çiyayên Alpê û li wir wan berdidin. Divê ew di ser çiyayên Alpê re ji hêla Italyayê bi qaçaxî xwe bigihînin Swîsrayê.

Di nav mij û şeva çiyayên Alpê de endamên komê wenda dibin. Meyrem li hêlekê birîndar û perîşan dimîne û di dawiyê de ji hêla polîsên Swîsî ve tevî hinên din tê girtin. Li milê din Heyder rê wenda dike û tev kurê xwe şeveke xeddar di nav berf û pûka çiyayên Alpê de derbas dike. Sibeya roja din kesekî Swîsî li wan rast tê û wan digihîne nexweşxaneyêke Swîsrayê. Kurîk di nexweşxaneyê de dimre, bav bi sûcê derbaskirina sînor û kuştina lawê xwe ji hêla polîs ve tê girtin.

Filîm pirr baş hatiye çêkirin. Kesên di filîm de, bi taybetî Necmettin Çobanoglu, rola xwe pirr baş dilîze. Di sala 1989'an de li Tirkîyê û li Swîsrayê wêneyên wê hatine kişandinê. Piranî bi Tirkî, lê herweha Italî û Almanîya Swîsrayê jî di filîm de tê axaftin. Di festîvala filîman de filîmê "Rêwîtiya Hêviyê" îsal, tevî du filîmên din, wek filîmê biyanî yê herî çêtir **"Xelata Akademiye"** girt. Mixabin, Xavier Koller di filîmê xwe de behsa Kurdbûna Heyder û Meyremê nake. Bi gotina wî (Rojnameya Sydney Morning Herald: 6/12/91), xwediyê serpêhatiyê (Kur-

dekî ji bakurê Kurdistanê) nexwestiye ne navê wî û ne warê wî bîn binavkirin. Keller herweha diyar kiriye ku kişandina wêneyên filîm li Tirkîyê dest pê kiriye, û yê ku di filîm de rol girtine Kurd û Tirk bûne. Wisa, wî nexwestibûye ji xwe û hevkarên xwe re gelş û probleman çêbike. Çiqa gotinên Keller di cih de bin jî, mixabin, mumkûn e ku ew tenê beşekî ji sedeman bin. Binavkirina qehremanê filîm wek Kurdekî wê filîmê Rêwîtiya Hêviyê bikira siyasî. Xuya ye ev ne armanca Keller e. Xavier Koller dixwaze bi rîya vê serpêhatiya trajîk sempatiyê ji penaberan" re li welatê xwe û li Ewropa peyda bike, lê herweha ji filîmê xwe re karekî

Em dibêjin welatê me bihuşt e, lê dijmin ew ji me re kiriye do-jeh. Ev ta radeyekê rast e, lê ne rastiya temam e. Hejmareke mezî ji me li bihuşt-teke hêsan digerîn. Ev kesên weha amadene ku li bajarên Ewropa, Australya û yên Rojhilata Navîn her karê qirêj bikin, lê nikarin, yan nizanin, li gundên xwe jiyanêke hêsan tir ji xwe re biafirînin.

aborî bike. Loma filîmê Keller jî siyasî ne vala ye.

Xweziya ev filîm jî hêla hemî Kurdan ve (herweha ji hêla xelkê hemî welatên Rohilata Navîn ve) bihata dîtin. Navê filîm divabû bibûya "Rêwîtiya Mirinê". Mirin li vir ne mirina zarokê ye, lê stûxarî, îxanet û nizimkirina qedir û qîmeta mirovan e. Bi hezaran kesên wek Heyder pezê xwe, zêr û zivên xwe, şelt û livînên xwe firotine, daku xwe bigihînin "bihuştê". Kesên di jiyana xwe de karê siyasî nekirine, şîret li wan hatine kirin û tên kirin, ku ew xwe wek penaberên siyasî bidin nasîn, da bikaribin têkevin "bihuştê". Bi vê şeweya siyasî û nesiya, rastî û derew tevlihev bûne û bi hezaran kesên ku rast penaberên siyasî ne, ji mafên xwe bêpar mane.

Em dibêjin welatê me bihuşt e, lê dijmin ew ji me re kiriye do-jeh. Ev ta radeyekê rast e, lê ne rastiya temam e. Hejmareke mezî ji me li bihuşt-teke hêsan digerîn. Ev kesên weha amade ne ku li bajarên Ewropa, Australya û yên Rojhilata Navîn her karê qirêj bikin, lê nikarin, yan nizanin, li gundên xwe jiyanêke hêsan tir ji

xwe re biafirînin. Dema kesên me digihên bajarên Ewropayê jî, piraniya wan li xizm û xwediyên xwe derewan dikin. Ma kî dibêje, ez li vir taxan paqij dikim, yan di aşxaneyan de firaxan dişom, yan qûna pîr û nexweşan dadimalim, yan li ser hesabê yê kar dikin û bacê didin, dijm! Hinên din jî hene, ku li ber tirimbêlekê xwe pik dikin, yan jî xwe didin kêleka keçîkekê û wêneyên erzan ji hevalên xwe yê çav û zikbirçî re rêdikin, şîrikê bi devên wan dixin, da bi hemî şeweyan he-wildana hatina "bihuştê" bikin.

Ewropa, Australya û Amerîka ne bihuşt in. Heger buhuşt bin jî, ew bihuştên beşekî ji gelên xwe ne. Hindek ji van welatên ku di xewn û xeyalên hinan de "bihuşt" in îro ji kesên biyanî re bûne do-jeh. Yê ji me, li van welatan heta radeyekê serketî ne jî, heta roja mirinê çavên wan li vegera welêt e, li xwe derewan dikin, da hêviya jiyînê venemire. Li min biborin, ez jî yek ji we me, lê segê fêr bibe jiyana nav taxên bajarên, êdî nema li gund vedigere. Ji bo me gelek girtina îbretan êdî dereng e, heger em vejerê bixwazin jî, girtina wê biryarê ne tenê bi me ve girêdayî ye... Lê xweziya riyek hebûya, da mirov bikariba ev yek bi wan kesan fêhmkirin bida, bi yê ku hîn daxwaza hatina "bihuştê" dikin. Hinek ji wan êdî ji nebihuştbûna "bihuştê" bawer jî nakin. Hevalekî min heye, dixwaze were "bihuştê". Australya ne welatekî hewqas nijadperest be jî, ji %10 xelkê wê bêtir nuha bêkar in, rewşa aborî xirab e, yê tî bi salan ji daîreya sosyalê diravên jiyînê digirin. Piştî hewqas name, piştî hewqas gazincên ji dûrbûn, hevalê min her li tembûra xwe dixwe, dixwaze were buhuştê xewn û xeyalan, do-jeha wendabûna me û zarokên me.

Em ji bo du salan, yan çaran yan pêncan tî "bihuştê", lê hatin çîqa dijwar be jî, vejer di-jwartir e. zaro li welatê nû mezî dibin, mirov fêrî jiyana taxan û çavîyên televîzyonê dibe û demokrasî jî dibe qulpeke di destê me de, îcar demokrasîya rast! De were demokrasîya rast were, were wan welatên ku Kurdistan li hev par kirine, da em jî vejerin! Tew hinek ji me, heger demokrasîya "rast" jî were, dîsa jî wê qîma wan neyê!!! Û Xwedê nikare Kurdistaneke "rizgar û azad" berî mirina wan mîsoger bike!!!

Stiriyên me

Lawikê Berrîvanî

Zimanê wî ne dirêj e

Kî dibêje çî bila bibêje, bi hemû kil û kêmasiyên xwe ve welatê me cardin ji Ewropayê xweştir bû. Li welêt jîyan, wek xwarina bi xwê, bi baharat bi ta'm û lezet bû. Bêyî siyasî, bêyî hîle û xurde ez bi xwe wek bav, wek mirovekî mezî pirr bîriya wan rojên xwe yê li welêt dikim, kesera wan rojan dikşînim.

Her tişt li alîkî, hema li mala xwe tenê ba jî meriv "tiştê" bû, bi kêmasî li welêt zarokan zaroktiya xwe, mezînan jî mezîniya xwe zanibû. Em bibêjin wek dê û bav, gava "hewce" buya, meriv dikanibû li gedê -zarokê- xwe raba, ew bitirsanda, ya jî ji bo **"terbiyekirinê"** du şîrmaqên bi tîr bavêtan belka guh. Gava meriv tiştêkî wiha dikir, ne kesî ev yek eyb didît û ne jî yê zarok digot, **"lêxistin yasax e, heger tu destê xwe bi min bikî ezê, telefonî polis bikim!"**

Li vê Ewropaya mîrat, me (wek bav, wek merivê mezî) ne tenê statuya xwe ya sosyal û siyasî, her wisa, me heq û huqûqê bavîti û mezînayê û otorîta xwe ya nav malê jî wenda kir. Êdî em rebenên Xwedê wek dê û bav ne kanî nîferekê li zarokên xwe bikin, ne kanî xeberekê ji wan re bidin û ne jî du "şîrmaqên" bavêjin zarokên xwe.

Zarokên li vir mezî bûne ji nîfiran, ji nav û nîçokan, ji xebir û cîrîsiyan fahm nakin. Û lêxistin jî ji xwe yasax e. De îcar wek dê û bav, ji bo mezînkirina zarokan çî jehr di destê me de dimîne? Emê zarokên xwe çawa **"Kurd bi-hêlin"** û ruhekî Kurdîyê bidin wan? Di nav vê civata dejenerebûyî û însanên **"bêehlaq"** de emê çawa kanîbin terbiyekê baş bidin zarokên xwe? Hemû aletên civakî, dîni, kulturî û tradîsiyonî ji destên me hatine girtin. Di rewşek wiha de here were di destê me de û bavan de tenê çavtirsandin maye. Îcar ew jî ku ji tîrsê fahm bikin û bitirsîn?

Wê rojê li hember qurretiya lawikê xwe yê biçûk (4 salî ye) êdî min hew kanîbû tehamul bikira, ji mecbûrî min got, **"de bes e zimandirêjîya bike!"**

Mêrîko hema di cî de hirinekê zimanê xwe derxist der, serê wî wek derziya maran li ba kir, hinekî jî berjêr nêrî û got:

- Zimanê min ne dirêj e, biçûk e.

Min got:

- De tu li min û vî pindikî, ez dibêjim çî, ew çî rê min dide?!

Xweha wî li kêleka me rûniştibû, got:

- Bawo! Lawik rast dibêje, te got zimanê wî dirêj e, zimane wî bi qasî yê te ye, normal e.

Yek ne bes bû, nuha li min bûbûn dudu. Min bala xwe dayê bi rehetî ezê nikanibim bi wan. Ji mecbûrî min got:

- De tu jî abûqatiyê meke, ku ez rabim ezê zimanê te ji kok de jêkim!

Îcar jî yê biçûk:

- Ê wê xwîn ji zimanê wê were û polis wê te bigrin.

Xanimê bala xwe dayê ku halê min ne tu hal e, got:

-Huş bin! Ez rabim ezê we bi qurbanî bavê we kim, ha! Keçîkê:

- Qurban çî ye?

Min ji xwe re got, de were vî kerî di vî buhurî re derbas ke! Ezê çawa "qurbanê" îzah bikim? Tehamula min hêdî hêdî nedima, lê min cardin jî xwe ragirt. Min got:

- "Qurban", qotika dilê te ye!

Lê, bila devê min bişkiya û min ev gotin negota. Îcar jî nebêje:

-Qotik? Qotik çî ye?

Ez serê we neêşînim, her çuqasî min got, **"ez rabim, ezê çavê te derxim, ezê ronîya te birjînim, ezê serê te ji laşê te hilqetînim"** qet pere nekîr. Tim digot: **"Çî?! Çî!?"** Dawiya dawiyê ji min re nebêje:

- Ma tu dîn bûyî?

Pîrsê ez tevizandim. Min xwîdan li xwe sar kir. Gelo bi rastî ez dîn bûbûm ya zarokên min ehmeq bûn (!!) Ev çî felaket bû hatibû serê min, ku "min" û zarokên xwe, li gel ku em bi yek zimanî dipeyivîn, me ji hev fêhm nedikir.!

Lawikê mezî heta wê gavê bê deng li me guhdar dikir, got:

-Bawo! tu zanî, mahkemeke Swêdî dikane van gotinên te wek deîlîlên teşebusî kuştinê qebûl bike.

Di jiyana Kurdewarî de rûpeleke nuh

Riza Polat

Li Kurdistanê Başûr rewşa Kurda ber bi başiyê ve diçe. Bi temamî ne bi dilê mirov be jî, ji neh deh mehan û vir ve ye ku Cepha Kurdistanî gelek gavên girîng û baş avêtin. Biryarên ku wê rûpeleke nuh di jiyana Kurdewarî de vekin, hatin stendin. Ji van biryaran yek, biryara hilbijartina meclîseke millî ye. Bê guman hilbijartina giştî gelekî muhîm e. Ev yek bi xwe re xwenuhkirinê tîne û ji alternatîfên nuh re rê vedike. Ji bo çareserkirina gelşên merheleyî ev gaweke bingeîn e. Hilbijartineke azad û demokratîk li her welatî, di jiyana gel, partî û dezgehên de roleke pozîtîf dilîze. Ew welat û rêxistinên ku di vê rîyê de nemeşiyane tu wextê nebûne numûneyên başî û qenciye. Hertim bûne numûneyên xerabî û nebaşiyê. Gelek serok û dîktatoran wextê dîr û dirêj dewlet û partî îdare kirin bîyî ku rê bidin kesên wek wan nafikirin dîtinên xwe bînin zimên. Kesên wiha pîrî caran bawer dikin ku wê bikaribin pîrsîrêkên xwe bi zorê çareser bikin. Û baweriya wan ew e ku bîyî zorê tu rîyên din tunene. Lê dûre her kes dibîne ku ev uslûb di jiyana welat û mûesasan de birînen kûr vedikin.

Demokrasi jî bo gelê Kurd tişteki pîr nuh e, gelê me heta nûha tu wextê bi îrada xwe di derheqê pêşeroja xwe de biryar nedaye. Bê guman ev jiyana nuh ya bi demokrasiyê re wê bi xwe re gelek pîrsîrêkan jî bîne. Çûnkî ev jî bo gelê me kultureke nuh e. Gelek ne dîr e ku salên pêşiyê bi gelek zahmetî û aloziyan derbas bibin û bedelek mezin jî bê dayin. Lê divê her kes jî bizanibe ku bîyî vê jî tu rê tune ye.

Heta îro gelek welat di bin nîrê diktatoriyê de bi dehan sal mane, lê roja ku ew diktatorî hilweşiyaye eşkere bûye ku li van welatan pêşketinek ber bi çav çênebûye. Wan hemwelatîyên xwe xapandine û ew di dinya xeyalan de hiştine. Wek mirov di rojê fîrtone de ku pêlên behrê berberî asîmanan dibin, têkeve behrê. Destpêkê mirov bawer dike ku mirov avjeniyê dike, lê wexta ku ba û pêlên behrê disekin, mirov dibîne ku mirov qet avjenî nekirîye û her li qeraxa behrê ye. Bi diktatoriyê welat îdare kirin her weha ye. Wexta diktator diroxe mirov dibîne ku li welatê tu pêşketinek çênebûye. Ji ber wê yekê jî çî zû an jî dereng baweriya min ewe ku her kesek pêwîst e di partîyan de, li welatan terefêrê demokrasiyêke bi rêk û pêk be. Rêyek din tune ye, tenê rê ewe ku demokrasiyêke tekûz û pîrdeng hebe.

Wek min li jor jî got demokrasi jî hilbijartin jî bo gelê Kurd tişteki nuh e. Hilbijartineke azad û demokratîk babetek û kulturek jiyane ye. Lê mixabin heta îro nehiştine di jiyana gelê me de ev rê bê bikaranîn.


Hilbijartineke azad û bi îrada gelê me bê mûbalaxa gawake dirokî ye. Berî her tiştî ev gelek sal in ku gelê me di bin nîrê dijmin de ye, tu carî îmkân nedîtiye ku li ser pêşeroja xwe bipeyive. Bi vê hilbijartinê gel wê di derheqê pêşeroja xwe de biryarê bide. Ez dikarim bêjim ku ji bo her Kurdekî li ser rûyê erdê ev gav tişteki bi qîmet e û di jiyana Kurdayetiyê de rûpeleke nuh vedike. Kurd wê li Kurdistanê bibin xwedî meclîsekê û xwedî biryar. Ev hebûna bi tenê ji bo gelê Kurd e ku bi salan e kul û derdê xwe û meramê xwe bi teqandina çend silahan tîne zimên, hebûneke pîr girîng e. Gelê Kurd wê ji îro pê ve êdî siyaseta û daxwazên xwe wê bi meclîs û mûesasan xwe ku ew bi îrada gelê me hatine hilbijartin, cî bîne.

Kurd bi vê gava xwe wê şexsiyeta xwe û yên cîranên xwe jî bidin xuya kirin. Kurd dikarin ji bo tevayîya dinyê bidin xuyakirinê ku gava nîr û zordariya cîranên wan ên mêtîngehkar ji ser stûyê wan bê rakirin, wê bikaribin li welatê xwe jiyaneke azad û demokratîk bi cih bikin.

Gelo tu kil û kîmasiyên vê biryara hilbijartinê tune? A rastî heta nûha ji teref Cepha Kurdistanî ve tu înfomasyonêke vekirî di derheqê hilbijartinê de nehatiye dayin. Tiştê hatiye bihîstin Cephe, çend caran civîya ye û pêşneyariya mûsterek a Partiya Demokrat a Kurdistanê û Yekîtiya Nîştîmanî Kurdistanê muneqeşe kirine. Pêşneyariya wan herdu hêzan ne demokratîk e. Çûnkî pêşneyariya herdu hêzan jî ji bo ku di mintiqeyekê de yek bikaribe bibe parlament, pêwîst e ji sedî hefte dengên bistîne. Îhtîmal ew e ku hêzên ku bikaribin vê barajê derbas bikin bes PDK, Yekîti û partiya konservatîv e. Ew îhtîmal e lê ji bo pêşeroja gelê Kurd û ji bo çareserkirina pîrsa Kurd îhtîmaleke ne rast e û ne li cî ye. Erê hebûna herdu merkezan li Kurdistanê unsurekî girîng e ji bo demokrasiyê, lê wexta tenya ev herdu hêz bin, her wextê meclîs dikare rola xwe nelîze û bibe meydana cudayiyên van herdu hêzan.

Lê eger hinek hêzên din jî di meclîsê de hebin, ew dikarin bibin balansa nava herdu merkezan. Bê şik di vê hilbijartinê de pîr dewlet û teref wê mihawele bikin ku destên wan tê de hebe. Her wekî tê zanîn partiyak nuh a konservatîf çêbûye ku meyla wê bi ser Îngilîzan û Suûdî ve ye.

Bes ez dîsa jî dibêjim gelek pêwîst e ku di hilbijartinan de her teref, her meyl an jî wek şexs û wek rêxistin divê herkes karibe beşdar bibe. Pêwîst e ku hilbijartin bi usûla xwe demokratîk û azad be û di atmosfereke bê mudaxele de derbas be. Bi van şertan pêwîst e ku her Kurd piştigiriya biryara hilbijartinê bike; ji bo ku meclîseke millî li perçekî Kurdistanê îrada gelê Kurd temsîl bike.



Umer Şêxmûs

Dibêjin ku "bi tenê Xwedê hemû tiştî dizane ?!"

Li hemû perçên Kurdistanê di nav rêxistin û tevgerên siyasî de tradisyonek(adet, teqlîd) pîr xerab hatiye danîn. Ew jî ji tevgera komunist a cihanê û nemaze ji Stalinîzmê û Maoîzmê hatiye wergirtin.

Di nava her partî, rêxistin, yan tevgerê de, serokê wê rêxistinê, yan jî sekreterê wê yê giştî bi dirêjiya deh salan û bê hilbijartin, bê kongre li cîhê xwe dimîne û nayê guhertin. Bi tenê, yan jî ji nav kadroyan bi alîkariya grûbeke biçûk hemû karên rêxistinê û tevgerê bi rê ve dibe.

Rojnamevan e, nivîskar e û alim e (car carna helbestvanê jî). Doktor e, mamoste ye, ekonom e û şervanekî startejîst e. Li ser ol(dîn), siyaseta, îdeolojî, fîzîk, estetik û felsefeyê dipeyive û gotinên wî wek gotinên zaneyê "Axir Zeman" tîne hesêb. Buroya politîk, komîta merkezi, rêxistin û hêzên pêşmerge(eger hebin) di bin destê wî de ne. Gotina wî gerek tim bê qebûlkirin û gava nehat qebûlkirin, gerek ew kesên qebûlnekirine ji nav rêxistinê bêne avêtin. Û bi navê xiyaretê, casûsiyê, zilamê dijmin, anarşîst û troçkîstiyê bêne îthamkirin. Di dîroka mirovatiya nuh de çend serokan xwe welê nîşan dan, di nav wan de; Hitler, Stalin, Mao, Kim Il-Sung, Çawuşesko û Seddam jî bi pilekê kêmtir. Çend serokên Kurd di wextê xwe de û nûha jî dixwazin ku xwe welê nîşan bidin. Têvî ku hinek derwêş ji wan re her mane, lê karê wan neçû serî, ji ber ku miletê Kurd şiyar e.

Gelek caran ev serok û sekreter, yan mele û şex in(ew jî melê 12-ilm in), yan dibistana ortê û lîse yan jî hinek ji wan unîversîtê qedandine.

Lê, em hemû baş dizanin ku jiyan di dawîya sedsala bîstan de çiqasî komplîse bûye. Tu serok, li hemû welatên cihanê di roja îro de bîyî alîkariya bi sedan pispor û dehan komîsyonan, li ser beşên cûda yên zanîne, nikare biryarê bi serê xwe bide, kar û baran bi serê xwe bi rê ve bibe. Gelek caran pêwîst dike ku planên dirêjmuhlet û seneryoyên cûda ji bo pêşeroja welat û miletê xwe bigrin. Lê digel vê jî, gelek caran şaşîyan dikin û hemû tişt li gora planên wan naçe serî. Gava ku biryar tê stadin, divê li ser bingeheke objektîv û zanistî be. (ne hissî û li ser pê, wek yên Kurda).

Rast e biryara dawî di destên serokê siyasî de dimîne, lê gelo ev serok bi hilbijartinê hatine serî? Gelo ew hemû biryarên xwe piştî lêkolînên pisporan digrin?

Her ji ber welê ye jî ku evqas çewtî û şaşîti di nav tevgera rizgarîxwaziya gelê Kurd de tîne kirin û gelek firsendên mezin ên dîrokî ji destê miletê me diçin, çûnkî biryar di destê yek, yan çend kesan de ye ku bi tenê biryarê didin û pileya zanîna wan ne li gor vî karî ye (yan bi tenê îmkân nîne ku pê re bigên).

Wexta wê hatiye ku êdî rêxistinên miletê me jî guhertinên pêwîst bikin û bi rengê modern û zanistî bixebitin û bi zeman û çaxê re bimeşin. Çûnkî "serokên" me ne Xwedê ne ku her tiştî bizanin?!

Newroza 1992'an

Li Ewropayê pîrozkirina şevên Newrozê zû dest pê dike û heta meha Nîsanê jî dom dike. Ji ber ku îsal roja 21'ê Adarê roja şemiyê ye, wê rojê wê li gelek bajarên Ewropayê şevên Newrozê bîr pîrozkin. Ji ber vê yekê jî reqabeta li ser hunermendan îsal wê ji salên çûyî pirtir be.

Li Ewropayê şeva pêşî ya Newroza îsal HEVKAR'ê bi proqramek gelek dewlemend dest pê kir. Di roja 22'ê Sibata de li Hamburgê bi beşdariya hunermend û şexsiyetên wek Şivan Perwer, Delal, Ciwan Haco, Emekçî, Diyar, Eyaz, Mehdi Zana, Mahmut Baksî, Behram Arda, H. Diljen Sawia-Sulka Gruppe şeveke dewlemend çêbû. Di şevê de dia hat nîşandan. Ji 2000'î pirtir Kurd û dostên Kurda beşdarî şevê bûn.

Mehdi Zana Newroza gel pîroz kir û wiha got: "Dilê min tije ye. Rewşa welat hûn dizanin çawa ye. Çar aliyên Kurdistanê di şer de ye. Zarokên me her roj şehîd dikevin. Birayên me di nav xwînê dene dibin lingên cendirman, faşîstên

xwîn xwar û bobeyên wan de ne. Lê bila kêfa wan neyê, em ê wan di nav xwîna xwe de, bifetîsin. Me sond xwariye em paş ve vena-kişin."

Axaftina nivîskarê Kovara Medya Guneşî Behram Arda, ji terefê beşdarên şevê ve bi diqet hat guhdarîkirin. B. Arda di axaftina xwe de li ser rewşa Kurdistanê ya nûha û li ser wezîfeyên hêz û kesên sosyalîst, şoresger û welatparêz ên Kurd rawestiya û bi kurtî wiha got: "Dewleta Tirk bi hemû hêz û dezgehên xwe ve li Kurdistanê şerekî qirêj didomîne. Hukumeta îro dirûtiyê dike. Divê em hemû li hember vî şerê qirêj şiyar bin. Divê Kurd şerê hev nekin. Şerê hev kirin xizmeta şerê qirêj e ku ji aliyê dewleta Tirk ve tê domandin. Kurdistan têra me hemûyan dike."

Li alî din roja 10'ê Nîsanê li Norwêçê li bajarê Stavengerê bi beşdariya Wezîrê Derve

yê Norwêçî û Ciwan Haco, Şivan Perwer û gelek hunermendên din wê Newrozê bîr pîrozkin.

Şevek mezin ji bo pîrozkirina

Newrozê li Stockholmê her di 21'ê Adarê de li Solna Sporthallenê ji aliyê Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê ve tê amadekirin. □



Bîstêk ji şeva Newroza HEVKAR'ê ya li Hamburgê

Divê em xwe ji alfabetîzebûna Tirkî xelas bikin

S. Rêvîng

Ji ber sê sedeman gotûbêja li ser alfabeya Kurdî ya bi tîpên latînî û rastnivîsandina Kurdî îro ji berê pêwîstir e:

a- Ji ber çî be bila bibe, hinek tîpên alfabeya Celadet Bedirxanî ku cara yekem di gulana 1932 an de bi derketina Hawarê di nav Kurdan de belav bû, ji aliyê şiklên xwe ve wekî xwe neman; di destpêka salên 1960'î de bi derketina hinek kovar û pirtûkên Kurdî, wek **Reşo Zilan** jî di nivîsa xwe de (Bergeh, hej. 8/91) dibêje, tîpa **i** wek **i**, **i** wek **ı**, **ê** wek **e**, **x** wek **ğ**, **û** wek **u** û **u** wek **ü** tîpa **w** wek **v** hat nivîsandin.

Van guhartinan şopa xwe li ser Kurdên Kurdistanê Bakur hişt û piştî 1980'î li Ewropayê bi derçûna kovar û rojnameyên Kurdî problemê careke din serî hilda; vê carê bi piranî gotûbêj li ser şiklên **i** û **ı** yên alfabeya Celadet Bedirxanî bû. Tevî ku li Ewropayê hejmarên pêşî yên kovar û rojnamên kurdî pir in ji gotûbêjên li ser şiklên **i** û **ı** yê, lê heta îro jî di kovar, rojname û pirtûkên Kurdî de yek cûre alfabe nayê bi kar anîn; hinek **i** û **ı** dinivîsin, hinek **i** û **ı** dinivîsin.

b- Hîn di dema destpêka salên 1930'î de di nav kadroyên Hawarê de gotûbêj li ser alfabeya Kurdî ya bi tîpên latînî çûbûne; **Osman Sebrî** li ser nebûna tîpên **ç-p-k-t** yên 'hişk' di civînekê de ku Celadet Bedirxan bixwe jî amade bûye, nêrînen xwe pêşkêş kirine, "lê" dibêje Osman Sebrî "...camêrên di civînekê de giranî nedan gotina min û min jî got: 'Dibînim vê gotina min di serê we de cih negirt. Lê çî gava komelek zanistî li Kurdistanê pêk bê, ez dê vê kêmaniya di elîfbêya Kurdî de bidim ser çavên wê komelê...". "...di navê de çil sal borîn, ne Kurdistan û ne jî komela zanistî ya ku min dixwest vê kêmaniya di elîfbê de raveyê bikim, çar bû. (Hêvî, hej.2) Osman Sebrî "ji ber ku şopa heyîna van herfan winda nebe", di sala 1982'an de bi navê **Elîfbêya Tikûz** alfabeyeke ji 35 tîpan pêkhatî çêdike û dide çapê. Ji bilî alfabeya wî çend alfabeyên din jî ku ji 35 yan 37 tîpan pêk tên çap bûne. **Qanatê Kurdo** di pirtûka xwe ya bi navê **Zimanê Kurdî-Rêziman** de alfabeyeke ji 38 tîpan pêkhatî pêşkêş dike. Di alfabeya wî de ev tîp hene ku di ya Celadet Bedirxanî de nînin; **ç'-e'-g'-h'-k'-p'-r'**.

Dîsan Celadet Bedirxan û Qenatê Kurdo li ser xusûsiyet û hejmarê 'tîpên dengdêr' (C.B), 'sewtên dengani' (Q.K.) ne wekî hev difikirin. Li gor Celadet Bedirxanî "...di zmanê me de 8 herfên dengdêr hene, ji van pênc **a, o, û, ê, î** dengdêrên dirêj û sisê **e, i, u** dengdêrên kin in...". "...di dengayîya kurdî de dengdêrek carinan kin û carinan drêj nabit., yanî herçî dengdêrên ku kin in, drêjên wan nîne û herçî drêj in, kinên wan peyda nabin." (Hawar, hej.10, r: 4) Di alfabeya Qenatê Kurdo de 38 tîp hene û ji wan "sewtên dengani

yên dirêj : **a,ê,î, o, u, e, ı, û** sewtên dengani yên kurt **a, ı, e, o, u, y, ê, i** ne." Di du xalan de Qenatê Kurdo ne wek Celadet Bedirxanî difikire: 1- Ew tîpa 'y' jî wek tîpeke dengdêr qebûl dike. 2- bi ya Qenatê Kurdo dengdêrek dikare hem dirêj, hem jî kin be. Ew dibêje: "Li zmanê kurdî da ferqîya li nav sewtên dirêj û kurt da tune. Sewtên dengani wusan jî bilind û nizm têna gotinê..." (Zimanê Kurdî-Rêziman, r:11-12)

c- Dewleta Tirkîyê mecbûr ma ku qedexeya li pêş axaftin û nivîsandina zimanê Kurdî - eger di pratîkê de dîsan jî pêşî lê bigre - rake. Ji niha ve hinek kovar û rojnamên Kurdî dest bi weşanê kirine û dibe ku hejmara wan herku diçe, pitir bibe. Bi vê yekê bivê nevwê problema nivîsandina du şiklên cuda ji bo dengê **k** û **ı** i, yan **i** û **ı** û belkî jî alfabeyên ji 31, yan 35, yan 38 tîpan pêkhatî bîn bi kar anîn, yan jî gotûbêjên li ser alfabeyê di nav rûpelên wan de çap bibin. Anku ev problem li ser axa welatî jî serî hildin û bin sedema alozî û tevliheviyê.

Jixwe di warê rastnivîsandinê de çî li Kurdistanê, çî li Ewropayê Kurd girêdayî hinek qeydeyên **Hawar, Ronahî, Roja Nû** neman. Di vî warî de jî tevliheviyeke mezin heye. Kesên ku kovar, rojname û pirtûkên piştî 1980'yî ketine çapê û kovarên navbûrî bidin ber hev, wê bi hêsanî vê yekê bibînin. Bi taybetî rojname **Kurmançî** ya **Enstîtuya Kurdî ya Parisê** di vî warî de numûneyek e. "Kurmançîaxêv", yan nivîskarên Kurmançiyê çî cara di babetê rastnivîsandinê de bi awayekî ciddî 'Hawar', 'Ronahî', 'Roja Nû' nedane ber çavan, ji bo pêşîlêgirtina tevliheviyan, yan bi hev re bikaranîna hinek qeydeyên rastnivîsandinê û gotûbêjan çî cara bi awayekî ciddî ji bona ku redaksiyonên kovar û rojnamên Kurdî, nivîskarên Kurd bicivin, nexebitiye.

Lewra sedem çî bin bila bibin, di warên alfabe û rastnivîsandinê de cudayî, problemin derketine pêşîya me. Dema rewş ev be û kes nekare hinek tîpan, yan qeyde rastnivîsandinê bi kotekî li hinekên din bide qebûl kirin, kes nekare tarîxa damezirandina dezgehên xwedî otorîte û biryarên zanistî bide destê Kurdan, wek **Reşo Zilan** daxwaza munaqeşe nekirina pirsan (Bergeh, hej.8/91, r:79) dawîya dawî dibe bincilkirina probleman. Problem şax vedidin, cihê xwe digrin. Belavbûna şaşîyan karê dezgehên xwedî biryarên zanistî jî zehmettir dike.

Bi ya min berî ku ev alozî li perçê herî mezin û li nav nufûsa herî mezin ya Kurmançîaxêvên Kurd belav bibin, gotûbêja li ser wan û hewldana ji bo yek cûre alfabe û yek cûre rastnivîsandin, tevî nebûna dezgehên otorîter, yan bisporên Kurd jî, baştir e ji bîdengiyê, çûnkî Kurdan berî peydabûna dezgeh, yan bisporan dest bi nivîsandina Kurdîya bi tîpên

latînî kiriye û wê binivîsin jî. Bê guman dema tê nivîsandin jî wê ev problem serî hildin. Em bipên jî, problem napên.

Himên alfabeya Kurdî

Alfabeya Kurdî ya bi tîpên latînî ku em îro bi giştî bi kar tinin, li ser kîjan himan şiklê xwe yê îro girtiye? Celadet Bedirxanî çima **ç'- k'- p'- t'** yên hişk wek dengên bingehîn û cuda nexistine alfabeya xwe? Wî çima 'A' bilindek (kumik) daniye ser tîpa **i** û nuqteyek daniye ser tîpa **i** ? Çima tîpên **c-ç-s-** wek ji aliyê şikil ve wek yên alfabeya Tirkî ne? Ji bo bersiva van pirsan, eger piçek dirêj jî be, gotinên Celadet Bedirxanî li vir dinivîsin:

"...Lê berî destpêkirina berhevdanê divê herçî esas û bingeh hene ko ji me re bûne him û el-fabe li ser wan hatiye danîn, bêne xuya kirin. Me ev bingehên ha di dora şeş destûran de gihandine hev.

1- Ji wan niqtan pêve ko xasê denganiya zmanê kurdî ne, di şikl û dengên herfan de, herçend heye, xwe li elfabêya tirkî nîzing xistin û jê dûr neketin. Armanca el-fabê sekinandina dengan li ser kaxezê bi şiklan e, şikl bi herfan tînen nîşan kirin, û herf qebalewî û bihemd in. Ji lewre nîşankirina dengê (Ç) bi (c) û yê (Ç) bi (ç) û bi hev guhartin û cihguhastina wan wek hev û bêferq e. Lê bi vî awayî kurdên welatê jorîn û heçî ko elfabêya tirkî dinasin, dê bikarin bê dijwari ya kurdî hîn bibin û komel û kitêbên ne bi hêsanî bixwinin.

2- Herçend dibe, ewçend dengên herfên latînî ên adetî ko di zmanên din de nas in, di elfabêya kurdî de hîlanîn û neguhertin. Bi vî awayî kurd dê bikaribin elfabêya biyanîyan û biyanî ya me bi hêsanî fêr bibin.

3- Nîşankirina her dengî bi herfeke serxwe û ji awayê herfên hevedudanî xwe dûr xistin. Bê şik e ko hînbûn, xwendin û nivîsandin û lêkdana herfên serxwe ji yên hevedudanî hêsanîr e.

4- Her dengî bi herfeke cihê nîşan kirin, yanî ji awayê nîşankirina çend dengan bi herfêkê, an dengêkî bi çend herfan, xwe dan alî. Ev awa ji fikra çêkirina elfabekê bi hindik herfan an jî qesda qenc li ser sekinandina denganiyê dikare bizê. Lê pê her du jî nakevin dest û di zmanî de bela sebeb pirsinen di şiklê de ciyok peyda dibin û di nivîsandinê de tevliheviye mezin berpê dibe. Jixwe di tu zmanî de dengani û nivîsandin ne lîvên yek in, û nivîsandin nikare bi tevayî li denganiya wî zmanî bê. Lewre ko kitik û rengên denganiyê bi elfabêyê nayin nîşan kirin û li ser kaxezê sekinandin. Welê bûwa di-viyabû elfabêya her zmanî ji (50-60) herfan hevedudanî bibe.

5- Herçend heye, ji barkirina herfan bi nîşanên nû, xwe dan alî.

Nîşan ji helekê di nivîsandinê de bi vegera qelemê wextî dide winda kirin. Ji hêla din bi jibîrkirina nîşanê herf vedigerin ser şiklên xwe ên eslî, bînan, û tevlihev dibin. Pejirandina çend nîşanan bi hev re; ev jî dijwarîke din e. Ji lewre ji bona tevayîya herfên binîşan me ev (A) pejirand, û bi bilindek nav lê kir. Ji ber ko dengên herfan hem diguherîne, hem bilind dike, û ji nîşanên wek (-, -') qenc têt veqetandin. Jixwe boşbûna nîşanan nivîsandinê kirêt dike.

6- Herfên welê bijartin ko di şiklên xwe de li hev bîn û bikevin hev. Ji lewre diviyabû ko em di nav herfên latînî de bimînin û ji elfabeyên din wek yûnanî û rûsî herfan megrin. Me jî welê kir û elfabêya xwe bi hindik guhartina dengên herfên latînî û bi barkirina hinan bi bilindekê çêkir. Bi vî awayî û li gora destûrên jorîn me elfabêya xwe bi sih û yek herfan hevedu daniye. Herwekî di destpêkê de me da zanîn. Sehîtiya ko di her sê zarên kurdî de hatine çêkirin, xuya kirine ko di zmanê kurdî de dengên bingehî ev sih û yek deng in. Ev jî bi van sih û yek herfan hatine nîşan kirin. Belê herfin hene ko geh zirav, geh stûr, geh ji pêşî, geh ji paşiyê tînen xwendin. Lê ev ferqên ha ne ji guherîna cihderka dengan, lêbelê ji guherîna rengê dengan tîne pê, û ji lewre di elfabê de nayin nîşan kirin. Ji ber ko elfabê tenê dengan nîşan dike, ne rengê dengan." (HAWAR, hej.2 rûp. 6-7)

Destûrên ku Celadet Bedirxanî alfabeya xwe li ser daniye, pir vekirî ne. Ne pêwîstî ravekirineke cuda ne.

Ç, K, T, P yên "hişk"

Lê eger bala we kişandibe, di benda çaran û di dawîya benda şeşan de ger bi nav nekiribe jî Celadet Bedirxanî li ser **ç-k-p-t** yên 'hişk' nêrîna xwe gotiye. Bi ya wî divê mirov xwe "ji awayê nîşankirina çend dengan bi herfêkê, an dengêkî bi çend herfan" bide alî. Çûnkî "Ev awa di zmanî de bela sebeb pirsinen di şiklê de ciyok (pirsîn ku mana wan nêzî hev an wek hev in) peyda dibin û di nivîsandinê de tevliheviye mezin berpê dibe. Ji xwe di tu zmanî de dengani (tevayî û halê 'dengî', herf carekê bi bi şiklên xwe, carekê bi denginiya xwe tîne seh kirin) û nivîsandin ne lîvên yek in û nivîsandin nikare bi tevayî li denganiya wî zmanî bê. Lewra ko kitik û rengên denganiyê bi elfabêyê nayin nîşan kirin û li ser kaxezê sekinandin. Welê bûwa di-viyabû elfabêya her zmanî ji (50-60) herfan hevedudanî be." (Benda Çaran). Di dawîya benda şeşan de Celadet Bedirxan nêrîna xwe hîn zelaltir dike: "Sehîtiya ko di her sê zarên kurdî de hatiye çêkirin, xuya kiriye ko di zmanê kurdî de dengên bingehî ev sih û yek deng in. Ew jî bi van sih û yek herfan hatine nîşan kirin. Belê herfin

hene ko geh zirav, geh stûr, geh ji pêşî, geh ji paşiyê tînen xwendin. Lê ev ferqên ha ne ji guherîna cihderka (cihê ku deng jê derdikeve, kaniya deng) dengan, lê belê ji guherîna rengê dengan tîne pê û ji lewre di elfabê de nayin nîşan kirin. Ji ber ko elfabê tenê dengan nîşan dike, ne rengê dengan." Xuya dibe ku Celadet Bedirxan hişkbûn, yan nermbûn, zirav, yan stûrbûna **k-ç-p-t** yê wek sifetê van herfan dibîne, û ev sîfet jî bi serê xwe tîr nakin ku ev herf wek herfên 'bingehî' bîn qebûl kirin. Ev bi serê xwe ne dengê in, lê guherîna dengê **k-ç-p-t** yê adetî ne. Û ev guherîn jî wek herfêkê nakevin alfabeyê. Lê tevî vî nêrîna xwe jî Celadet Bedirxanî carna ev guherîna he wek herfeke serbixwe - bi tenê **k** ya hişk - nivîsandiye.:

* Kanî Zewkî, Welat-Kevêr, Ebasan Dawûdiyan, Omerkan, ka Kheran(1)

Ma kher bûne tu deng nayê ji tuwan"

(1) Me "kher" yanî mirovê ko nabihîze, bi vî awayî nivîsand ko ji kerê heywan bête veqetandin. Ji xwe ev "kh" ji ya din stûrtir e. (Hawar, hej.25 rûp.3). Lê belê bi vî awayî nivîsandin bi tenê di çerçewa **kh** yê de maye û ew jî ne pir in. Di vî warî de du nivîsarên hêja; yek ya **Zagros Haco**, yek ya **Rizgar Baran di Armançê** de çap bûn. (Hej. 109, 111) Encama balkêş ya lêkolîneke biçûk ya Rizgar Baran xuya dibe ku di nivîsareke ji 1700 tîpan pêkhatî de 45 **k** hene û ji wan 36 **k** yên hişk û 9 **k** yên adetî ne. Anku hejmara **k** yên hişk ya ku Celadet Bedirxanî carna bi awayê **kh** nîşan kiriye, pitir e ji hejmara **k** yên nerm. Mixabin heta îro li ser hejmara **k, ç, p, t** yên hişk, an adetî, û li ser hejmara peyvên ku bi bikaranîna **k, ç, p, t** yên hişk di şûna yên nerm de tevliheviya manayê derdixin, îstatîstîkên tekûz nînin. Bê guman babetên weha bi hebûna van îstatîstîkan zelaltir dibin.

Piştî destûrên alfabeya xwe, Celadet Bedirxan yek bi yek li ser tîpên dengdêr û her weha tîpên ku xasî denganiya zimanê Kurdî ne, yan ji aliyê şikil ve wek yên alfabeya Tirkî ne, radiweste.

Tîpên C, Ç, Ş, X

Bi ya wî ji aliyê şikil ve 17 tîp "...di elfabêya her zmanî de, bi ferqine kiçik yek in: **b d g h k l m n p r s t f v w y z**" (Hawar, hej. 2 rûp.7)

C û Ç "Di destê me de (c) û (ç) mane. Me ev ji bona nîşankirina dengên (Ç) û (ç) hîlanîbûn. Gora eslê van herfan dengê (Ç) ji (ç) bêtir bi (c) dihat nîşankirin. Herwekî di latîniya kevin, di babelîska şeşan de, ko diket pêşîya (e, i, y, æ, œ) dengê (ç) a me dida, mîna dengê (z) ya elmanî, wekî niho di pirsên jêrîn de: (Ceres, Cicero, centum, circus, Cyrus, Cesar, cetos, caremonia). Di gel vê hindê me ev herf ji pêşîya xwe vekir, dengê wê ê kevin da alî û em di warê qebalewî

li ser alfabeya Kurdî

de man. Ji ber ko qebale li destûra me a pêşîn çêtir dihat û ji bona feda kirina wê destûrê çî fêde, çî kotekî hebû. Di encamê de me dengê (ç) bi (c) û yê (ç) bi (ç) nîşan kirin. (Hawar, hej.8 rûp.9)

Tîpa 'Ş': "Ev herf berdêla (ش) a erebî ye. Dengê vê herfê di frensizî bi (ch), di elmanî bi (sch), û di inglîzîyê de bi (sh) têt nîşan kirin. Ji herfên latînî ji bona nîşankirina vî dengî di destê me de tu herf nemabûn. Gora destûreke me, diviyabû em bi herfên hevedudanî emel mekin. Destûra me a pêşîn em dixistin nîzîngî elfabeya tirkan. Ji hêla din ve cihderka vî dengî gelek nîzîngî cihderka herfa (s) ye. Miletên ko di zmanê wan de ev deng nîne, li şûna wî (s) dibêjin. Di zmanê yûnanî de (s) nîne. Ji lewre yûnaniyên ko nû dest bi frensîzîyê dikin, şûna (chambre-şambr) (sambr) dibêjin û pîrsa (paşa) (pasa) dixwînin. Di encamê de me ev deng, wek tirkan bi vê herfê nîşan kir. Jixwe ev şîkl di elfabeya xelkê Romanyayê de jî mîj ve hebû. (Hawar, hej.6 rûp. 6)

Tîpa 'X': "Ev herfa ko di elfabeya erebî de bi herfa (خ) têt nîşan kirin, di hin zmanên arî de jî heye, wekî niho elman vî dengî bi (ch) nîşan dikin. Lê mîletên din wek yûnanan, bi (x) dinivînin. Ev herfa ha di hin elfabeyan de wek ya frensîzan, du dangan bi hev re dinivîne û dide xwendin, yanî dengê wê yê dutakî heye. Her wekî: Alexandra-Aleksandra û Exemple-Egzeple. Ji ber ko dengê wê ê dutakî ji me re ne gerek bû, me ev herfa ha wek yûnanan û hin mîletên din ji bona nîşankirina dengê (x) êxiste nav elfabeya xwe. (Hawar, hej.6 rûp.7)

Çima "i"?

Tîpên e - i - u -- ê - î - û : "Niho ev şeş herf hene ko di pêşberê hev de, du tofên di şîklê de nîzîngî hev dihatin pê. Em van çarên jêrîn bigrin destê xwe û bi wan mîjûl bibin: e - i - ê - î

Lê her wekî me berê jî gotibû, di denganiya Kurdî de dengdêrek carinan kin û carinan drêj nabit, yanî herçim dengdêrên ko kin in, drêjên wan nîne û herçî drêj in, kinên wan peyda nabin. Ji ber vê yekê dengdêra (e) herçend bête drêj kirin, tucar nabit (ê) ji ber ko cihderkên wan ji hev cuda ne. Herwekî (i) jî bi drêjkirinê nabit (î). Di destên me de tu herfên din nemabûn, û li gor destûreke me diviyabû em herfên hevedudanî emel mekin. Ji lewra ji bona nîşankirina tofa pêşîn me ev (i) nîşana ha pejirand û navê wê kir bilindek. Ev nîşana ha di hin elfabeyên din de jî heye. Lê bi vê ferqa ko di elfabeyên din de dengê dengdêran weke xwe dihêle, cihderkên wan naguherîne, tinê bilind dide xwendin. Di elfabeya me de du karên wê hene: Dengê dengdêran diguherîne û bilind dide xwendin. Lewma dengdêrên bi bilindek hemî jî drêj in û tucar kin nayin xwendin. Li gora destûrên me ên bîngehî, ko ji bona çêkirina elfabeya xwe me pêk anî û di pêşîya vê bendê de da zanîn, diviyabû ko em bê sebebê zor ji elfabeya Tirkan dûr mekevin. Li hire, di herfên (i) û (î) de em ji ya wan dûr ketin. Tirk (i) ya kin bi

(i) ke bê niqte nîşan dikin. Heke me jî welê bikira û (i) ya kin bi (i) ke bê niqte û ya drêj bi (î) ke adetî nîşan bikira çêtir nedibû? No, ji ber ko (i) ke bê niqte di nav herfên (u, n, m) û di pêş û paşîya hin herfan de tevî wan dibe û ji wan derêxistina wê dikeve dişwariyê. Jixwe Tirk jî piştî çêkirina elfabeya xwe pê hesiyar û ji bona veqetandina (i) ke bêniqte ji herfên jorîn - ko ketiye rex an nava wan - ser herfa ko berî (i) yê dihat îşaretek berdidan. Bê şik e ko me nikaribû em bikevin nerastiyeke welê ko ji aliyê daniyê xwe ve hatibû nîşan kirin. Jû pêve, herwekî heta niho xuya bû, ji lewra ko dengayiyên van du zmanan cihê ne, isûlê dengdêrên Kurdî bivê nevê ji isûlê Tirkan dûr ketiye." (Hawar, hej.10, rûp. 4, hej.11, rûp.5).

Wek têt dîtin, Celadet Bedirxan windabûna i yê, yan i ya bêniqte di nav, yan pêş û paşiyên tîpên m, n, u de wek sedema serekî ji xwe re dibîne û ji ber ku i wînda nebe, xwendin zehmettir nebe, (.) niqteyekê datîne ser û dibêje ji bona ku ev herf tevî herfên din nebe, Tirkan di alfabeya xwe de îşaretek danîne ser herfa ko berî i yê dihat. Eger di salên 1930'î de ev îşaret hebûye jî, xwendevanên ku niha dikarin bi Tirkî bixwînin û binivîsin, dizanin ku niha Tirk tu îşareta dananin ser herfa ko berî i yê têt, û hebûna herfa i, yan i ya bêniqte dixwendin, yan nivîsandinê de tu tevliheviyan derxase. Dimîne niqta duyem ku ew cihêbûna dengayiyên her du zimanan e ku "isûlê dengdêrên kurdî bivê nevê ji isûlê dengdêrên tirkî" bi dûr xistiye. Bê guman mirov dikare vê xusûsiyetê bide ber çav û bi danîna niqteyekê li ser i yê ji alfabeya Tirkan bi dûr bikeve. Lê eger Celadet Bedirxanî niqteyek nedaniba ser i yê û wek i bihişt, wê Kurdan ev herf wek i ya alfabeya Tirkî bixwendana? Na. Ji ber ku em qala du zimanên cuda, û du alfabe-yên ku li gor dengên wan zimanan hatine çêkirin, dikin. Dirêjtir, yan kintirbûna i ya Kurdî ji i ya Tirkî di vî warî de hîç rolekê nalîze. Çunkî yên ku deng dide îşaretan em in. Neku ji bo her dengêkî dengdar, yan bédeng îşaretek standard heye û her mîlet wan bi kar tînin. Eger zarokêkî Kurd ku ji sinifa yekem, heta unîwersîteyê bi Kurdî xwendibe û di alfabeya ku ew fêr bûyî de i hebe wê yekser herfê nas bike û bizane dengê wê çî ye, eger i hebe, wê dîsa wê herfê nas bike û deng bîdiyê. Dema em qala alfabeya Kurdî dikin, bê guman em qala yek alfabe-yê dikin, û niyeta kesî ji me jî tune ye ku di ber alfabeya Kurdî re, ya Tirkî jî wek alfabe ya zimanê esasî fêrî zarokên me bike, heta ku tevlihevî peyda bibin. Di mesela bilindek (i), kumikan de jî nêrîna Reşo Zilan ji rastiyê dûr e. Ew dibêje: "Jixwe di zimanê kurdî de sê dengdar hene, ku ew jî dengdêrên 'ê', 'î', û 'û' yê ne, dirêj in. Eger em vê nîşana girîng ji ser yekê ji wan rakin, gelo maneya li ser yê din hiştine çî ye?" "Ew nîşana kumî ya ku hatiye ser vê grafemê, ango bilindek - nîşana sirkumfleksê - dide xuya kirin ku divê ev dengdar bête dirêj kirin, dirêj bête bi lêv kirin. Hinek zimanên din, ji bo dirêjkirina dengda-

rên dirêj yên zimanê xwe riyine din dane ber xwe. Wan yan bi riya cotnekirina tîpên bédeng yên bi dû re tînin, yan bi riya bikaranîna du gramefan, yan jî bi riya çend nîşanên bi hev re ev pîrsgirek çareser kirine. Heçî Mîr Celadet ew xwe (ji awayê nîşankirina çend dengên bi herfekê, an dengêkî bi çend herfan), yan jî bi bikaranîna çend nîşanan bi hev re dide alî, ku helwêsteke pîr rast û di cih de ye. Ji lewre ew vê nîşana bilindekê çêtir dibîne û diêxe ser her sê dengdêrên me yên dirêj. Mîna hin zimanên din, di zimanê kurdî de jî taybetmendîya serekî ya vê nîşanê dirêjkirina dengdaran e." (Bergeh, hej. 8-1991 rûp. 83)

Carê di zimanê Kurdî de ne sê dengdêrên dirêj, lê pênc dengdêrên dirêj hene û ew jî a-o-ê-î-û ne. Wek têt dîtin jî bilindek li ser a û o yê tune ye. Mana wê ew e ku a û o dengdêrên kin in? Bê guman na. Ya duyem ji nivîsa Reşo Zilan ku me li jor dabû, xuya dibe ku ew dixwaze gotinên Celadet Bedirxan di vî warî de ji xwe re bike pişt. Lê di gotinên Celadet Bedirxanî de ku wî xistiye nav kevanan, peyvek bi tenê jî li ser xusûsiyeta (i) bilindekê tune ye

Çima "î" ya bi kumîk?

Di eslê xwe de Celadet Bedirxan ne tagirê bikaranîna nîşandekan e. Bi ya wî nîşandek "nivîsarê kirêtî dikin, ji jîbîrkirina wan herf car din vedigerin ser eslê xwe yê berê û di manayan de tevlihevî peyda dibe." Sedemên ku Celadet Bedirxan mecbûrî bikaranîna (i) bilindekê dikin, ne dirêjbûna i, ê, û yê ye. Lê du sedemên din in.

1- Celadet Bedirxanî nexwestîye herfên du, yan sê alfabe-yên cuda tîxe nav alfabe ya xwe. Wî herfên alfabe ya xwe di çerçewa alfabe ya bi herfên latînî de hiştîye û nexwestîye ji alfabe-yên din herfan bigre, ji ber ku herfên alfabe ya wî li hev bîn. Lewra jî ji destpêkê heta şîklê dawî yê alfabe-yê, du, sê caran alfabe ya xwe guherîye, dawîya dawî li ser alfabe ya bi herfên latînî sekiniye. Her weha di bendeke destûra alfabe ya xwe de ew dibêje ku divê em herfên hevedudanî bi kar neyînin.

2- Dema ku ew herfên alfabe ya latînî li ser dengên zimanê Kurdî belav dike, ji bo ê-î yê di destên wî de tu herfên alfabe ya latînî namînin, ew jî naxwaze herfên hevedudanî bi kar bîne û paşê bi bilindekê ê î yê ji e û i yê vediqetîne: "e, i-ê, î. Di destên me de tu herfên din nemabûn, û gora destûreke me diviyabû em herfên hevedudanî emel mekin. Ji lewre jî bîna tofa paşîn (ê, î) me ev (i) nîşana ha pejirand û navê kir bilindek. Ev nîşana ha di hin alfabe-yên din de jî heye. Lê bi ferqa ko di alfabe-yên din de dengê dengdêran wekî xwe dihêle, cihderkên wan naguherîne, tinê bilind dide xwendin. Di alfabe ya me de du karên wê hene: Dengê dengdêran diguherîne û bilind dide xwendin. Lewma dengdêrên bi bilindek hemî jî dirêj in û tucar kin nayin xwendin". (Hawar, hej. 10. rûp.4)

Di yar e. Ji ber ku tu herfên din di destê wî de nemane û nexwestîye herfên hevedudanî bi kar bîne, bi riya danîna (i) bilindekê li ser e yê û bi rakirina niqteya li ser i yê û şûna wê danîna bilindekê du herfên serbixwe çêkirine. Bi

vî awayî hem di nav çerçewa alfabe ya bi tîpên latînî de maye, hem jî tîpên hevedudanî bi kar neanîne. Xusûsiyet, yan taybetmendîya serekî ya (i) bilindekê jî di zimanê Kurdî de wekî ku Reşo Zilan dibêje ne "dirêjkirina dengdaran" e. Lê ev nîşan herfekê dike herfeke din, cihderka herfan diguherîne, dengê e diguherîne, dike ê, dengê î diguherîne, dike î. Ev xusûsiyeta serekî ya vê nîşanê ye, û dirêjkirina deng dibe xusûsiyeta duyem û ne serekî. Ne serekî, çunkî wek me got, a û o jî dengdêrên dirêj in, lê li ser wan ev nîşan tune ye. Eger armanca Celadet Bedirxanî bi danîna şîklê i ji bo dengê î veqetandina i ya Kurdî jî i ya Tirkî bûya, wê ev nîşan danîba ser a ya Kurdî jî, çunkî a ya Kurdî dirêjtir e ji ya Tirkî, lê wek şîkil her du jî eynî ne û ev nayê wê manê ku dema em a ya Kurdî dixwînin, yan dibêjin, ji ber ku bilindek li ser tune ye, em wê qasî a ya Tirkan kin dixwînin.

Ji aliyê din, kesên ku bi tenê tîpên i-î yên Celadet Bedirxanî diguherin û bi awayên i-î dinivîsinin jî, ji vî karê xwe re bi ya min sedemeke yekcar bêbingeh didin pêş: "Hêsantir e." Çima? "Çunkî nêzî alfabe ya Tirkî ye û piraniya Kurdan li Kurdistana Tirkîyê dijîn." Di destên me de îstatîstîkên xwendewariya Kurdên li Kurdistana Tirkîyê tune ne. Lê em dizanin ku eger 12 milyon Kurd lê hebin, her 12 milyon tevde ne xwenda ne û alfabe ya Tirkî nizanin, heta bi Tirkî peyivînê jî nizanin. Anku peyva 'piranî' ne sedemeke di cih de ye. Ya din gava cara pêşî alfabe ya Celadet hat guhertin, (salên 1960) tîpên ê-û-x-w jî hatin guhertin û awayên ê-û-ğ-v hatin nivîsandin. Dibe ku hin alfabe ya Celadet nehatibû dîtin, yê dîtîbin jî hem ji ber nebûna makîne û çapxaneyên ku îşareta (i) yê binivîsinin, hem jî ji ber ku bi Tirkî alfabetîze bûbûn û nêzî alfabe ya Tirkî nivîsandin ji wan re hêsantir dihat, bêtî ku li ser karê xwe bifikirin, weha nivîsandin. Lê piştî salên 1980'yî Kurdên ku alfabe ya Celadet dîtine, li Ewropayê bûne xwedî îmkânên makîne, weşanxane, çapxane, lê dîsa jî bi îsrarî i-î dinivîsinin, sedemeke bêbingehtir ji yê berî xwe didin pêş. Çunkî eger hêsantir e ji bo Kurdên Kurdistana Tirkîyê, lêxa divê em x ji wek g ya Tirkî, û wek u ya Tirkî, u wek ü ya Tirkî, ê ji wek (é) ya ku berê dihat nivîsandin, binivîsin. Bi tenê dûvika i, i' yê girtin, îfadeke bêbingeh e. Ya din jî berde wamiya tevlihevî û dîrbûna ji yekcûre alfabe nivîsandin e. Îro hejmara kes, weşanxane, pirtûkên ku i, i dinivîsinin, pitir e ji yê ku i, i dinivîsinin, lê di xwendin û nivîsandina i, i yê de problemê ewqas mezin ku pêwîstî guherandinê be, derneketiye pêşîya me. Dema Tirk ji alfabe ya bi tîpên Erebi derbasî ya bi tîpên latînî bûn, bi carekê derbas bûn û vê derbasbûnê demekî dirêj ajot; li seranserî welat jî bo hînbûna tîpên nû bû seferberî, rojname û kovar demekî bi her di tîpan hatin nivîsandin di vî warî de problemên giran hatin çareser kirin, tevî ku wekî îro teknîk bi pêş de

neçûbû, rojname, kovar, xwendewarî, tv. radyo bi vî awayî nebûbûn malê xelkê. Bi tenê i û i yê problem kirin, zehmet dîtin, - qala guhertina x, û, u, ê yê nekirin-, bi ya min xwe ji alfabetîzebûna Tirkî xilas nekirin e. Bi taybetî Kurdên Kurdistana Tirkîyê gava li alfabe ya Kurdî ya bi tîpên latînî dinêrin, ji ber ku alfabetîzebûna bi Tirkî di mejî de cih girtiye, wek alfabe-yê serbixwe, wek alfabe ya zimanekî din li ya Kurdî nanêrin; yek ser alfabe ya Tirkî têt bîra wan û her cûdayîyek ji wê wek problemêkê serî hil dide. Her weha ew vê ferqîya ji alfabe ya Tirkî pîr mezin dikin. Heçku ev ferqîti wê bibe sedem ku Kurd bi salan nekarin hînî i û i yê bibin û lewra jî nexwenda binivîsin. Di vî warî de Amed Tigrîs di nivîseke xwe de (Berbang. Hej.74) 'sedemeke' nû tîne, ew dibêje, li Swêdê zarokên ku hînî alfabe ya Swêdî bûne, dema i ya Kurdî dibînin, wek i ya Swêdî (wek i ya Kurdî) dixwînin û ji ber ku di piraniya alfabe-yên zimanên Ewropî de i ya me di şîklê i de ye, û çavên zarokan hînî wê îşaretê bûye, peyvên Kurdî wek; min, dil, kirin bi awayê min, dil, kirin dixwînin, lewra jî divê em bi Kurdî bi awayên i û i binivîsinin. Amed Tigrîs li Swêdê mamostatiya zimanê Kurdî dike û divê bizanibe ku di piraniya alfabe-yên zimanên Ewropî de c ya me yan k ye, yan s ye, x ya me yan îks, yan eks e, q ya me eynî deng nîne, bo nimûne di Swêdî de dema tîpa k berî tîpên j, i, y â de têt, dibe ş. Ew qet qala van tiştan nake. Ya din ma alfabe ya me ji bo zarokên Kurd yê li Swêdê, yan li welatekî Ewropayê ku berê hînî alfabe ya wî zimanî dibin û paşê jî heftiyê du caran bi Kurdî dixwînin, hatiye çêkirin? Alfabe ya Celadet Bedirxanî hem ji aliyê dengên Kurdî, hem ji aliyê şîklên tîpan ve ji bo nivîsandinê bersiva xusûsiyetên zimanê me dide. Pêwîstiya guhertina wê alfabe-yê nuha tune ye. Danerê wê çawa danibe divê em jî îro weke wî bidomînin. Lê ev nayê wê manayê jî ku em li ser babetên ku pêwîstî munaqesê ne nepeyivin. Belê li ser peyivîn divê wî mafî nede ku her kes rabe, bi serê xwe tîpina biguhere, yan lê zêde bike. Divê em mesûliyeta xwe bizanibin û bi guhertinê keyfî nebin sedemên tevliheviyan. Riya rast ew e ku li gor rewşa îro dezgeh (bi taybetî Enstîtuya Kurdî ya Parîsê), kovar, rojname û nivîskarên Kurd bi hev re, bi ser û ber, bi mesûliyetê serperîştîya vê yekê bikin. Û divê êdî em ji wê çerçewa teng a i û i yê derkevin. Çunkî problemên ku bi rastî ji problem in û divê ji îro li ser bîn peyivîn, li benda me ne; 1-Kurd bi sê alfabe-yên dinivîsin. Kîjan alfabe ji bo zimanê Kurdî ya herî baş e, heta îro zêde li ser nehatiye peyivîn. Ma heta kengê em ê kovar, rojname yan pirtûkên bi du alfabe-yan biweşînin? 2-Bi teknolojiya pêşketî girêdan û tîkiliyên nav welat û gelan êdî bi riya makîneyên modern wek kompîtur, teleks, telefaksên ku ji tîpên standart pêkhatine, têt avakirin. Di vî warî de kêmasîya alfabe ya me heye yan na?

Çîrok

JI ZARGOTINA ME

Kerro û Kulik

Berhevkar: Emîn Narozi

Çîroka "Kerro û Kulik" bi kilamî ye û ji kasetê hatiye girtin. Band ji ji devê dengbêjekî bi navê Şakir (ne ew Şakirê dengbêjê ye bi navê deng e) hatiye dagirtin.

Ev çîrok di tayê çîroka "Siyabend û Xecê" yan jî ya "Siti û Ferik" de ye û mîna wan jî li gelek herêmên Kurdistanê, li civat û caxiyan, bi stran tê gotin. Bil ji vî ew gelek caran di radyoya Eriwanê, di beşa Kurdî de jî tê weşandin. Lê hefta niha min ew li tu cihî nivîsandî nedîtîye. Ji vî bûnê min xwest ez wê ji windabûnê xilas bikim û bighînim destê xwendevanan.

Wexta min ev çîrok ji ber şerîte girt, wan awayên din ên ku di nav xelkê de tîn gotin jî dan berhev û li gor wê hinekî li hev rast kir.

Kulik û Kerro du bira bûne û navê diya wan jî Werdekê bûye. Ev herdu bira biraziyên Emer Axayê Milî bûne.

Emer Axa rojekê gazî temamî fêris û palewanên xwe dike û wan li diwana xwe dicivîne. Li wir ew radibe fîncana qahwê tevî taximê zêrîn dide ser destê Perîşan Xanimê qîza xwe û li ber van egîdan digêrîne û ew hûrik hûrik di ber de jî dike gînegîn.

Ew kesê ku fîncana qahwê ji destê Perîşanê bigre û here mihîna Hecî Salihê Gêsi, Bilêcanê, ji min re bîne, dê ewê "bi qewlê Resûlê Xwedê û bi hedîsa Pêxember" Perîşanê ji min bistîne.

Hewqa egîd û mîrxasan wî tev serê xwe pêl dike, dixin nav gavên xwe û bi darikên çîxarê erdê dixepêrin, dike fîncana qahwê. Lê tu deng ji wan demayê û kesek jî bersîva Emer Axayê Milî nade.

Li gor salixê salixdanan Kulik hingê şivan bûye û li ber pez bûye. Dema bîravanê diçûne bîriyê ew timî diçû pêşîya wan û ji wan dipirsi:

-Gelo îro li civata apê min çî hebû?

Wê rojê wan jê re got:

-Belê, apê te îro temamê eşîra Kîkan û ya Milan li hev civandiye, fîncana qahwê daye ser destê Perîşan xanimê li diwanê dide gerandin û dibêje:

-Kî rahêje fîncana qahwê ji ser destê Perîşanê hilîne, dê here Bilêcana Hecî Salihê Gêsi ji min re bîne, ez jî dê bi helaliya Xwedê Perîşanê bidimê.

Dem a Kulik vî yekê dibihîze hima pêre dar û kulavê xwe davêje û berê xwe dide diwana apê xwe. Çewa Kulik derbasî hundur dibe, radihêje fîncanan qahwê ji ser destê Perîşanê hilîne, dirêje erdê û dibêje:

-Apo yê ku here Bilêcana Hecî Salihê Gêsi bîne û Perîşan xanimê jî ji te bistîne ez im.

Li gor gotinên gotinbêjan navê mihîna Kulik Zozikê û navê hespê Kerro jî Seklawî bûye. Herduya rabû hesp û mihîna xwe ji tewlê kişand, teng û bertengên wan şidandin, li wan siwar bûn û berê xwe dan Ximê Binê Beriyê. Gava ku ew bi rê ketin, Werdekê ji pa re li wan kire gazî:

-Lawno! Ka rawestin, çend şîretên min hene, divê ez li we bikim. Lê şîrê pêsîra min li we heram be ger hûn bi ya min nekin. Kurên min tembûn û wes-yeta min li we be ku hûn tu carî hespên xwe berî pey xezalan nedin. Lewra xezal bîyewm in, bîoxiriyê bi xwe re

tînin. Xeyn ji vî jî, Ximê Binê Beriyê tiye kevirê çeqmeqa ye, nalên lingê hespan dimehîne. Haya we jê hebe ku hûn vî talûkê bi dana ser xezalan bêh-tir nekin. Yek din; bira çavên we timî li ser Zozikê be ku ew neçe ser golgeniyan û avê ji wan venexwe. Ya dawî agahdariya li ser xalê we ye. Çimki li Ximê Binê Beriyê bi navê Hesê Dûdî merivêk heye. Ew Hesê Dûdî xalê we ye, heft heb kurê wî hene.

Ew fîncana gurê sibatê devbixwîn in, Mîna hirçên bi birin in, Qelûnên wan mezin in, Heft ritil û niv titûn hiltînin, Li ser piştê kihêl û manekîya Dûyê çîxarê jî devê hevdu direvinin.

Încar temeniya min li we be lawo dema hûn ketine Ximê Binê Beriyê xalên xwe bixwe bihisînin. Eger hûn gotina xwe bi wan nexin, helak û zewaleke we hebe wê bi destê xalanên we be. De herin oxir û felekên we yê xêrê bin lawo. Piştî van gotinan wan xatir ji diya xwe xwest û bi rê ketin, berê xwe dane oxirê û piştê xwe dane felekê.

Çi serê xwe û we biêşînim, ger ji hindikî ger ji pirî ew demeke dûvedirêj bi rê ve diçin. Wextê ku nêzikayî li Ximê Binê Beriyê dike xezalek ji ber wan radibe. Kulik hima qet namerdî nake, berê Zozikê dide bi ser xezalê ve. Kerro jê hêvî dike:

-Bira, min bi te û te jî bi Xwedê Zozikê najo ser xezalê! Wesiyeta diya me ye, him ji me re gotiye bîyewm e û him jî şîrê xwe li me heram kiriye. Kulik qet gotina wî ji xwe re nake bar û piştî û dibêje:

-De heyra dev jê berde ev tiştêk jî nabe û zengo li Zozikê dişidîne. Wî li vî alî û wî alî xezalê gerand, wê girt û anî ba Kerro.

-Kerrê bira, bi Xwedê ez û Zozikê tev zahf rat bûne û xeweke mirarokî ji ketiye çavên min, ezê hinek xewa xwe bistînim. Gava te xezal paht gazi min bike emê nanê xwe bixwîn. Lê çavêkî te jî li ser Zozikê be, tafîlî ew here golgeniyan. Kulik kete xewê, Kerro jî rabû xezal gurand, sûşt, ew paht lê qemîş nekir ku wî ji xewa şêrîn şiyar ke. Wî jî rabû xwe li tenîştê Kulik vezeland, li hêvîya şiyarbûna wî, lê ew jî bêhemd di xew re çû.

Kulê tu kul bi di mala Kerro kevi, xewa Kerro jî heft roj û heft şev e. Berî ku ew şiyar bibe Kulik di xew de dibîne ku agirêkî girtiye hêsiya konê wî û pêlîdanên agir çûne ber perê esmana. Kulik hima ji cih diferqize, baz-dide û bala xwe didê ku Zozikê tune ye.

Li vî alî û wî alî li Zozikê digere, dîna xwe didê ku çî bibîne, waye Zozikê çûye ava golgeniya vexwariye, xwe merixandiye û di nav de pêşmurde bûye. Kulik Zozikê girt, anî cem Kerro, wî jî xew şiyar kir û got:

Hela binê malxirabo ka Zozikê ketiye çî halî! Lê poşmanî fêde nekir û tiştê çû wan neda dî. Dawiyê ew li ser xwarina xwe rûniştin. Piştî xwarina nan Kulik berê xwe da bi ser avê ve, dema gihîştê ser avê bala xwe dayê ku wa kihêlek di destê peyaki de ye. Wî peyayî ew kihêl hêdî kişand ser avê û bi taseke zêrîn av dayê. Wextê ku Ku-

lik ev yek dît xwe negirt û gazîkir.

-Peyê! Ma ev çî qantir e ku tu di tase zêrîn de avê didiyê?

Peya jî qet namerdî nekir û bersîva wî da:

-Qê çavên te kor bûne lawo? Ma qewî te nav û dengê Bilêcana Hecî Salihê Gêsi sah nekiriye? Kulik bi vî gotinê pir hêrs bû û xwe gihande wî, sileyek dawêşandê. Peyê min û te li hev zîzîkî, şîşî erdê bû û di cih de xerîqî. Kulik rahiştê hefsarê Bilêcanê û anî ba Kerroyê bira. Dema Kerro vî yekê dibîne kêfa wî tê û jê re dibêje:

-Bira, hemin va ye me Bilêcanê zeft kiriye, were em bê şer, bê daw û doz ji xwe re bidin rê û lêxin herin. Kulik dibêje:

-Na, ez qesem dikim bi zatê Xwedê heta ez li vir şerêkî giran bi mîrê Ximê Binê Beriyê, Hecî Salihê Gêsi re nekim, ez piyê xwe ji vir navêjim tu cihî. Sibê wê ew di nav xelkê de bêje "wan mihîna min dizin û birin çûn. Ez vî yekê tu car nayim ser xwe û birê xwe."

-Ê bira hey wusa ye, madem tu bê şer nasekinî qene yan bi hespê min, Seklawî, yan jî bi Bilêcanê derkeve şer. Tu zanî, Zozikê ava golgeniya vexwariye ew nikare baş şer bike, ew te ji meydana cengê xilas nake.

-Bira gava ku ez bi Seklawî herim şer, sibê dev li hev keve tî bîjî "te mîrênî bi hespê min kir". U ez bi Bilêcanê jî herim dîsa ew tan e. Na heyra ez dê bi Zozikê herim. Gava Kulik çû meydana cengê, wî û peyayên Hecî Salih hev pir birin û anîn. Wî gelek ji betel û pêlwanên Hecî Salih dane erdê û kuştin. Wer bû ku kes hew diwêribû jê re derkeve qada şer. Rewşa Hecî Salih welê bû ku tu mefera wî nema bîlî xwe avêtina Hesê Dûdî, neyarê kevin.

Tevî ku ew û Hesê Dûdî, xalê Kulik i ker, dijmînê hev bûn jî dîsa Hecî Salih wer mecbûr ma ku rabû egala xwe li serê jîna xwe pêça û laçika (çarîk, terhî) jîna xwe jî da serê xwe û berê xwe da mala Hesê Dûdî.

-Me xwe li Xwedê û li we girtiye û xwe avêtîye ser tejkên we. Her çiqas em neyar in jî ev bûye mesela xîretê. Ji vî sibê ve du siwar hatine nava me him erz û eyal û him jî terş û talan û namûsên me tev peymal kirine û tu mîrên me nehiştine. Em hatine vir, me xwe avêtîye tor û bextê we, hewar û gaziya me bi tenê hûn mane.

Piştî vî gotinê, Hesê gazi her heft kurên xwe dike, wan li hev dicivîne û bi wan dişewire:

Lawo, li gor serboriyê min ev her du siwarên ha, hebin tunebin, ji tuxmê me ne. Bi gumana min di tarîxek kevin de xuşkeke me bi navê Werdekê hebû. Ew di dema maciriyê de wunda bûbû, ez dibêjim wê ev her du fêrisên heja zaroyên wê bin. Încar eger ku hûn bi ya min bikin em naçin hewarê û tîkiliya xwe bi wan naynin, lê dîsa hûn zanin. Nizanim gelo hûn dibêjin çî?

Şeş heb ji kurên Hesê wek bavê xwe difikirin û naxwazin herin hewarê. Lê yê piçûk dilê wî di qîza Hecî Salih de ye. Ji vî bûnê li himber bav û birayê xwe derdikeve û bi Hecî Salih û jîna wî re berê xwe dide şer. Pa biratî ye, gava ew siwar dibe diçe şer, birayên wî jî xwe ranagirin û ew jî didine

dû wî û dadikevin meydana şer.

Încar em werin ser wan û navrasta şer.

Hey wî wî... wî wî wî... wî wî wî... wî wî wî,

wî wî wî... ê de hey wî wî...,

Min dît sibe ye Kulik bi sê denga bang dike:

-Kerro lo bira hela tu dîna xwe bidê,

wê zê bi dîyarî Ximê Binê Beriyê ketim wa bi dar e,

Îro li ser serê birayê te, Xwedê dizane şer e, şer giran e,

Xwedê, kulê bi kul be, bikeve derê mala Kerrikî biran e.

Kerro ketiye xewê lê xewa wî ya heft roj û heft şevan e.

De wî wî... wî wî wî... wî wî wî, wî wî wî... wî wî wî...

Li ser serê... Kulikê bira şer giran e.

Şîreşîrê di hespan e.

Tê dengê darên van rîman e.

Welle bi Xwedê gelek mîr kuştine li meydana e.

Bûye helhelê lawê xweşmêra, nalînê birindaran e.

Wî wî wî...

Lê xew li Kerro giran bûye, ma qey ji xew radibe?

De wî wî... sibe ye wê zê bi dîyarî Ximê Binê Beriyê diketim

ji kula dilê min û te re heyra bira bişewite wa bi zebeş e.

Ezê dîna xwe didimê heft heb xalên Kulik bi ser ve girtine,

bi qaydê mîja rûyê erdê, tavi û teyrokên bihara rim bi ser de direşînin wa dimeşe.

Kulik lê xistiye xalê xwe yê mezin kuştîye, li meydana mane şeş e,

hey wî wî... wî wî wî... wî wî wî... wî wî wî...

wî wî wî...

Dîsa Kerro pê nehisiya. Kulik him serê xwe didomîne û him jî di ber de baciya dibêje û dilorîne, ka Kerroyê bira bi xwe nahisîne:

De hey wî wî... wî wî wî wî wî wî... wî wî wî wî wî wî... de hey wî wî...

De dayê rebenê sibê sibe ye dilê min ji dila re dilekî dîn e.

Emer Axa xêrê bike lê xêrê qet nebîne.

De bira dergûşa kurî li ber himbêza xwe nebîne⁽¹⁾

Genim biçîne, zîwanê li dewşê hilîne.

Çewa li defa hewarê dixê hezar û pînsed siwarê Kîkan û Milan li hev dicivîne.

Fîncana qahwê tevî taximê zêrîn li ser destê Perîşanê qîza xwe datîne.

Dibêje "kî fîncana qahwê ji ser destê wê hilîne"

U here Bilêcana Hecî Salihê Gêsi ji min re bîne,

Dê ew Perîşanê ji xwe re ji min bistîne.

Qet ji Xwedê natirse xwarziyan bi ser xalan ve dişîne,

Wî wî wî wî wî wî... hey wî wî...

De dayê rebenê sibe ye wê zê bi dîyarî Ximê Binê Beriyê diketim ji kula dilê min û te re wa bi şenc e.

De îro min dît şîreşîra van hespan e.

Xweş tê dengê van rîman e.

Xwedê dizane xalan li ser xwarziya kiriye kafiristan e.

Kulik lê xistiye, Xwedê zane, xalekî xwe yê dîn ji kuştîye îro li meydana mane pînc e.

Wî wî wî... wî wî wî wî wî wî... wî wî wî... hey wî wî...

Vê carê ji Kerro ji xew ranebû; Ku-

lik jî hey şerê xwe didomîne.

De hey wî wî... Kulik bi sê denga bang dike:

Min dît şerêkî li me çêbû; de qaleka li me qewimî,

li Ximê Binê Beriyê, li kevirê çeqmeqa, bişewite wê bi dar e.

De îro ev ya şerê eşîra nîne, belkî şerê xalan û xwarziyan e bi zirarê bê bihûr e.

Tu bala xwe bidê çewa xalan bi ser xwarziyan ve girtine fena gura dikin zûzûre.

Kulik derbek avêt ruhîni wa diqûre. Bala xwe dayê derbê xal hingaft û birin kûr e.

Wî xalekî xwe yê dîn ji kuşt, dayê rebenê li meydana bûne çar û çûr e.

Kuştina xala pê giran bû difikirî li bersîva diya pir e.

Wî wî wî... wî wî wî wî wî wî... ax de wî wî wî wî wî wî...

Çar xalê Kulik li meydana man. Wan dîna xwe dayê ku belê, yeko yeko ew ji heqê vî egîdî nayên der. Wan biryar da ku bi hev re êrîşê bibin ser, ger na wê wan ji hev wale wale bike. Wextê du heba ji wan bi hev re êrîşî wî kir,

hingê Kulik zengo li Zozikê şidand ku xwe ji ber êrîşê wan bide alî. Lê mixabin erqê kete pêşîya Zozikê. Wê jî ava golgeniya vexwaribû û ferqazên wê giran bûbûn. Ji vî bûnê wê erqê xilas nekir û şîşî erdê bû, xwe merixand. Wan bi hev re dirêjî ser kir, bi rîman filitînê; dil û gurçikên wî bi serê rîman ve deranîn. Kulik di dilê xwe de got: Ya Yezdanê herdu cihanan tu emanetê xwe ji min nestîni ta ku dengê Werdeka diya min dikeve guhê min.

Kerro jî hê di xewa malkambax de bû. Lê di wê gavê de wî xewneke xirab dît û ji xew veciniqî. Dema ku şiyar bû,

li dora xwe nihêr, lê pepûk reben, ne Kulik û ne jî Zozikê yek ji wan jî nexwuya ye. Kerro hima rabû da darê rimê û berê xwe da şer. Di rê de le-qayî Kulik hat. Kulik gurçika xwe nepenî xiste gizma xwe û dirêjî Kerro kir.

-Ca ji min re hinek ava cemidî bîne bira ew kul û hesret bi birê te re nemîne.

-Birayê min ma qey tu birindar î.

Na, lê wê gizmê baş bişo û hê avê tîxê. Wextê Kerro av di gizmê de werda bala xwe dayê ku gurçika Kulik ji navê ket.

Kerro gava bi vî yekê hisiya ji nîşka ve qêrînek ji şilkîfa serê wî cû û wek gurê sibatê, bê ser û çav bi nav van xalan ket. Ka em binêrin wî û xalan çî anî serê hev. Di wê navê de Kulik jî li wan seyr dike û di ber de jî hûrik hûrik dilorîne:

Hey wî wî... wî wî wî... yû hu yûû... hu yû hu... yû hu yûû...

hey wî wî hey wî wî wî wî wî wî... hey wî wî hey wî wî wî... de wî wî...

De Kerro birawooo... Ximê Binê Beriyê bişewite wa bi himê ye,

keko Ximê Binê Beriyê bişewite wa bi himê ye.

Min dît Kulik birindar e xwe daye ser darê vî rimê ye.

Kerro li vî alî û wî alî siwaran li hev du dizivîrîne,

wa ye xalekî dî ji kuşt li meydana mane sisê ye.

Kulik didomîne:

Kerro lo bira baranê wêş e wêş, na Welle Keko baranê rêş e, rêş e.

Îro mijê xwe daye çiya, dûmanê serê kumçika birê te girtî,

na Welle, ji kerb û wa'ca dilê min

Resamekî cotkar:

Abdullah Aksu

Abdullah Aksu, resamekî Kurd e. Piştî 12'ê Îlonê 6 salan di zindana Diyarbekirê de maye. Ji malbatekî feqîr tî. Tunebûniyê û jiyana gund û belengaziya jî hêviyên xwe radixe ser kaxez û paçikan. A. Aksu nuha bi nexweşiya tuberkulozê ketiye, di şertên dijwar de resamiya xwe li gundê xwe doidomîne. Me bi riya xuşka Evîn pê re pêwendî danî. Wî ji me re nameyek şand û di namê de xwe dide nasîn.



Ez di sala 1961'an de li mezra Siltoqê -girêdayî qeza Dêrikê ye- ji diya xwe bûm. Dibistana destpêkê min li gundê Koderê xwend. Dibistana navçe min li lîsa Wêranşarê xwend û di sala 1976'an de bêyî ku ez Tirkîyeke baş fêr bibim, min xwendina xwe temam kir. Ji ber tunebûnê min nikaribû xwendina xwe bidomand.

Di salên 1978-79'an de kar û xebata şoreşgerî li herêma min xurt bû û min jî xwe da vî karî. Ji ber ku malbata min, dost û hevalbendên malbata min, welatparêz û demokrat bûn, ne mimkun bû ku ez di bin tesîra wan de nemînim. Min jî zaroktiya xwe ve hez ji çand û welatê xwe dikir.

Weke ku hûn jî dizanin, welatparêzî û demokratbûn jî bo êrîşa 12'yê Îlonê têr dikir. Di 5'ê Sibata 1982'an de hatim girtin. Piştî îşkence û mahkemeyên dîr û dirêj di 19'yê Sibata 1985'an de 15 sal heps dan min. Lê belê di 6'ê Sibata 1988'an de derketim û min berê xwe da gundê xwe Siltoqê. Niha li vî gundî bi cotkariyê û carina jî bi çêkirina resim jiyanê xwe didomînim.

Ji piçûkayî ve şexsiyeteke min a hassas û bi mîraq heye. Her tiştê ku ez di tebiyetê de dibînim, bala min dikişîne. Li derûdora xwe tim bi çavekî kirîne dinêrim. Tiştên delal û xweş min dilşa dikin, yên kirêt û nexweş min aciz dikin. Belê li aliyekî daxwaziya pêkanîna tiştên delal û rewşa ku welatê min tê de ye û li aliyekî jî astengên kirdayeti û hepsa xisûsî ya Diyarbekirê.

Belê, rewşa ku tu garantiya

nexweşiya xwe ya birîna reş (tuberkuloz) bir. Bi kurtî wêne ez carek din anîm jiyanê.

Pirr mixabin, piştî ku ez derketim der, min fersenda pêşdebirina risimçêkirinê nedît. Malbata min ketibû bin deyna. Tu îmkana min a aborî tunebû. Ez ji bo eskeriyê hatim xwestin. Ji ber ku kîloya min ne li gor bejna min bû saleke bi paş de xistin û piştê jî ji ber hin nexweşiyên min ez ji eskeriyê azad bûm. Min tu car fersenda muayenabûnê û tedawibûnê nedît. Rewşa min a aborî û tendurustî rê nade ku ez bi risim mijûl bibim. Lê belê ji bo pêkanîna berpirsariya xwe ya pişeyî li hember gelê xwe çî ji destê min bê, ez dê bikim.

Xuya ye di 10-15 salên pêşiya me de di warê çandî û pişeyî de wê hin pêşketin çêbin. Li gel muzîk, helbest, nivîs û folklorê di warê resim de jî di pêkanîna hin berpirsariyan de vatîniya me ressamên jî heye.

Wek civak divê em di her aliyê jiyanê de zanîna xwe û hilberînên xwe yên tore û adetên xwe pêşde bibin. Di vî warî de berpirsariya ressamên Kurd gelek mezin e.

Resmên ku min çêkirine niha li Îstenbolê ne û hinekî jî ji ber bêperetiyê nikarin ji gund derkevin. Di fersenda pêşîn de ezê ji we re resmên xwe bişînim.

Ji gundê min ê şêrîn û piçûk û ji gundiyan min silavên germ ji we re.



Weşanên Nuh

Amadekar: Rohat


Kürdistan Teali Cemiyeti (Komela Pêşketina Kurdistanê), İsmail Gölbaş, Weşanên DOZ, 323 rûp. İstenbol, 1991.

Ev cara pêşîn e ku li ser dîroka Komela Pêşketina Kurdistanê lêkolîneke hewqas fireh tê amadekirin. Wek tê zanîn ev komel di sala 1918'an de hatîye sazîkirin, di destpêka sedsala me de roleke mezin di tekoşîna rizgarîya netewî de lîstîye. Nivîskar, sazûna vê komelê bi çavekî dîrokî, bi bûyerên wan salan ve girê dide û li ser vê rêxistinê, li ser avakirên wê û li ser ideolojîya wê dîtinên xwe pêşkêş dike. Ev pirtûk, pirtûka nivîskar ya pêşîn e.



Kürt Sorunu- Aydınlarımız Ne Düşünüyor? (Pîrsa Kurd- Ronakbîrên Me Çi Difikirin?), Weşanên CEM, 304 rûpel, İstenbol, 1992.

Di vê pirtûkê de bi qasî sî (30) nivîskar, rojnamevan, akademîsyen û ronakbîrên Tirk li ser pîrsa Kurd bawerî û dîtinên xwe pêşkêş dikin, wek Aziz Nesin, Atilla İlhan, Murat Belge, Yalçın Küçük, Mete Tunçay, Demirtaş Ceyhan... Ji van kesan çend heb in. Pirtûk li ser teknîka hevpeyvînan ava bûye. Berî ku hevpeyvîn dest pê dikin, di serê her beşê de, derheqê



berhemên van kesan de agahdarîyên kurt jî tên dayîn. Ev cara pêşîn e ku di platformeke weha fireh de hewqas ronakbîrên Tirk di nav rûpelên, pirtûkekê de hatine bal hev. Ev xebat bi metodên amadebûna xwe ve navê pirtûka Rafet Ballı tîne bîra mirov ku ew pirtûk jî dişa ji aliyê Weşanên Cem ve bi navê "Kürt Dosyası" (Dosya Kurdan, İstenbol, 1991) hatîye çapîkirin. Di vê pirtûka 624 rûpelî de ronakbîr û rêxistinên Kurd li ser problema Kurdî dîtinên xwe pêşkêş dikin.

Doğu Gerçeği ve Müslüman Kürtler (Rastiya Rojhilatê û Kurdên Misilman), Hüseyin Yılmaz, Weşanên TİMAŞ, 288 rûpel, İstenbol, 1991.

Nivîskar di vê pirtûkê de bi çavekî dînî (olî) li problema Kurd dinêre û ji bo çareserîkirina vê problemê pêşniyarên İslamî pêşkêş dike. Nivîskar, him li dijî tekoşîna gelê Kurd ya ji bo azadiyê derdikeve, him jî car caran şovenîzma li dijî gelê Kurd li Tirkîyê protesto dike û ji bo baweriyên xwe rêke nuh vedike. Di pirtûkê de li ser dîroka Kurd agahdarîyên kurt jî tên dayîn.



Ağa, Şeyh ve Devlet (Axa, Şêx û Dewlet), Martin van Bruinessen, Weşanên ÖZ-GE, 490 rûpel, Enqere, 1991?


Ev lêkolîna cara pêşîn wek xebateke doktorayê hatîye amadekirin û di sala 1978'ande li Hollandayê li bajarê Utrecht hatîye weşandin. Di nav çend salan de çend caran çap bû: Li Almanya (1989), li İngilterê (1991).

Di vê lêkolînê de organizebûna jiyîna civakî û polîtîk ya li Kurdistanê tê analîzîkirin. Di dawîya pirtûkê de navên çavkanîyan, fihrist û çend wêneyên li ser

Kurdan hene. **Remziye Aslan** pirtûk ji İngîlîzî wergerandîye zimanê Tirkî.

Doza Kurdistan (Kürdistan Davası), Zinar Silopî, 260 rûpel, Weşanên ÖZ-GE, Enqere, 1991.

Wek tê zanîn ev pirtûk cara pêşîn di sala 1969'an de li Beyrûdê hatîye çapîkirin û ji biranînên Zinar Silopî (Kadri Cemil Paşa) pêk tî. Ne tenê biranînên wî, her wusan jî dîrok, çand û koka Kurdan tê pêşkêşîkirin. Zimanê vê çapa nûh hatîye zelalkirin û bi jêrnotan (têbinî) ve hatîye dewlemendîkirin, **Mehmet Bayrak** ev kar pêk anîye. Ji aliyê din ve, ew sûretên ku di çapa pêşîn de di nav rûpelên pirtûkê de hatibûn belavîkirin, di vê çapa nûh de di dawîya pirtûkê de hatine berevkirin û wek beşeke bi serê xwe hatine çapîkirin. Bi kurtî ev çavkanîya dîrokî him ji aliyê zimên ve him jî, ji aliyê tehr ve gelek hatîye guhirandin, formeke hîn bi kêrhatî wergirtiye.



DIYARBEKİR RA

Hesenî GİRAN

28. 12. 1991

Gazetey Cumhuriyet'i di vizêr nuştêbi ki hedîseyanê Pasûr (Kulp) û Licê di û hedîseyê ki dim a bî di duyê (des û didi) tenî merdî. Nê hedîseyan ra pey, qezayê ki te de dikanî nêabî û şoforan kontaxê 'erebeyanê xwi pa-dayî inî yî: Tilerman (Kızıltepe), Dêrik, Kerboran (Dargeçit),

boylikerde esto. Labelê ê zî halê xwi ra memnun niyî.

Eyro ez kamî di ki qalî kena, behsê rojê Peşimî (26. 12. 1991) kenî.

Ay roj Meclisê Tirkîye di derheqê emniyetê daxiliyê Tirkîye di qalî bî, munaqêşe vejîya. Meb'usanê Şernexî (Şırnak) ra Wekilê Serekê Grûba SHP (Sosyaldemokrat Halkçı Partî)

Hênî, Dêrik, Tilerman, Güroy-mak (qezayê Bedlîsî yo) û Cizîr di dikanî vizêr abî. Vatişan gore, Şirwan, Misêbîn û Silopî (qezayê Şernexî yo) di heyani sernewe dikanî nêabenî. Patnos (qezayê Qerekosî yo) û Bayezîd (Doğu Bayazıt) di zî yew qismê dikandaran vizêr dikanê xwi nêakerdî.

Nuştîşê gazetey Yenî Ülke

gazetî ya. Kirdasî (Kurmancî) rewna amewo nuştîş labelê Zazakî raya verêni bi hewayêdo serbest (bê ki yasax bo) yeno nuştîş. Nusiyayîşê Zazakî Zazayan rê çiyêdo xam o û milleti miyan di nusiyayîşê Zazakî ser o zaf qalî benî. Aynanê ki roj-name veto, fedakareya jînî kes ganî xwi vîr a nêko. Ma jînî rî teşekkür kenî, ma jînî pîroz (imbarkên) kenî. Mela inawa dewam bikî û inî gazetî vejî.

Mêrdimê ki mi te de qalî kerd, zafê jînî vanî "Riperrê Zazakî tikêkî (tanî) yî. Ganî hûmaranê bînan di hîna zaf ca bido lehçeya Zazakî." Hewawo ki vanî, şaristananê Zazayan di Rojname hîna zaf yeno rotiş, hîna zaf rexbet vey-neno. Tanî wendoxî zî vanî "Ma nêzanê herfanê 'W, X, Q, Ê' biwanî. Eger hûmaranê ma ra ver di, ino xusus di îzehet bido zaf rind beno."

Gazetey Cumhuriyetî gore, Batman, Bedlîs, Cizîr, Farqîn, Misric, Silopî û Şernex di yew hewte ra ver dikanî û kontaxê 'erebeyanê gîriyaybî. Inê cayan di vizêr dikanî abî û 'erebeyanê şuxiliyay. Misêbîn di ino panc rojî yo ki dikanî û kontaxê 'erebeyanê gîrewte yî labelê kû (do) eyro abî. Uludere (qezayê Şernexî yo) û Tetwan (qezayê Bedlîsî yo) di eyro him dikanî him zî kontaxê 'erebeyanê padîyay.

Meb'usanê Kurdan ra Zubeyir Aydar vano "Ay bombeyê ki Batman di finayî tanî dikanan ser, gîştê kontr-gerilla te de esta. Bombeyê ki inî hedîsan di finayî, malê MKE (Makina Kimya Endüstrisi) yî. Delîlê ki bîy zî polîsan beyntar ra hewa nay."

SERRA NEWA (1992)

4. 1. 1992

Rojo ki Pîran di dikanî padîyay, ay roj telebanê Lîseya Pîranî zî dersî boykot kerdî. Çarşî û ca'deyanê Pîranî di pîya şîy-amey. Alaya (bêraxa) Kurdan zî xwi dest kerda, sloganî eşti. Heta verê berê Sara (binaya Adliye) û qereqolê Pîranî şî. Hetanî ay wextan çî kes têkilê (qarîşê) jînî nêbiyo. Gama ki şî berê qereqolî ver, emrê sawcî reydi polîsan çekî teqnay, telebey vila kerdî. Dim a çarres (14) telebey gîriyay.

8. 1. 1992

Hewawo ki gazetey Yenî Ülke (hûmar: 12) nuseno:

-Semedê protestokerdişê qetlî'aman ra 26. 12. 1991 û 27. 12. 1991 di qezayanê

Mûşî ra Melazgirt, Gumgum (Varto), Bulanik, nehiyeyanê Mûşî ra Ziyaret û Konukbekler di dikanî nêabî.

-27. 12. 1991 di Bedlîs di dikanî pêro padîyay.

-28. 12. 1991 di Qerekose (Ağrı) di bînya HEP di grevê veyşaney bi. Qezayanê Qerekosî ra Bayezîd, Patnos, Diya-dîn, Taşlıçay û Tutak di dikan-daran dikanê xwi nêakerdî. Sariqamiş (qezayê Qarsî yo) di bîna HEP di 80 tenî dest bi grevê veyşaney kerd. Inî grevî panc rojî ramit. Batman di him dikanî him zî kontaxê 'erebeyanê padîyay. Hesenkêf û Hezo (Kozluk) di zî dikanî nêabî.

-30. 12. 1991 di Tetwan di dikanî pêro padîyay. Avukatî nêdekewtî mehkemeyan, Lîseya Tetwanî ders nêkerd.

-Semedê protestokerdişê qetlî'aman ra 26. 12. 1991 ra heta 1. 1. 1992, miyanê Diyar-bekir, Pasûr û Pîranî ra se ra zafêr mêrdim gîriya. Pîran di polîsan çekê xwi ver bi asmên kerdî, teqnay. Lîseya Pîranî ra 14 tenî gîriyay, îşkence dî, be'dî sewqê DGM (Devlet Güvenlik Mahkemesi) bîy û ti ra hewt tenî tewqîf bîy.

-2. 1. 1992 di İxdir (qezayê Qarsî yo) di dikanî padîyay. Di hezarî dikandarî ewta dikanê xwi qefilnay. Beyntarê şaristanan di şîyayîş-ameyîşê (seferê) otobusan îptal bîy, 'ediliyay (vindertî). Mekteban di dersî boykot bîy.

13. 1. 1992

Hewawo ki gazetey Cumhuriyetî yo eyroyin nuseno, eskeran û tîman yew PKK'yî kışt. Cizîr di 10. 000 (des hezarî) mêrdimî cinaza jey berdi hewa nay (defn kerdî). Semedê ina 'eza ra Cizîr, Şernex û Silopî di dikanî padîyay.

-Vizêr telebey Fakulta Perwerdekarî (Eğitim Enstitüsü), Abdulsamet Çetîn (vîst serre) Diyarbekir di -Baxleran di- çekî reydi kişiya. Kes nêzano ki kamî kışto.

-Wekilê serekê HEP a Sêrtî Mehmet Demir vinî biyo, ino çêher rojî yo nêaseno. Walî û Mudirê Emniyetê Sêrtî vanî "Inasar yew mêrdim nê-tebîşiyawo". Hewawo ki vanî, polîsan nîzdî teştarî Mehmet Demir tebiştê berdo.

Peyniya tepîştîşî, îşkencî, kıştîşî, vînîbiyayîşê mêrdiman se bena? Peyniya inî guran se bena? Qorrî vanî "Eceba inka ra pey dora kamî ya?" Milleti bêhuzura. □



Çarşîni Diyarbekir di polîsê Tirkan

Hezex (İdil), Midyad (Midyat), Bismil, Farqîn (Silvan), Hezo (Kozluk), Misric (Kurtalan), Misêbîn (Nusaybin), Cizîr û Hezro. Labelê Pasûr (Kulp) di perey dikanî abî.

Semedê boykot û protestokerdişê qetlî'amê Meraşî (1978) û qetlî'amanê Pasûrî û Licê ra, Üniversita Dicle ra 100 heb telebe tepîşiyawo.

Hewawo ki gazetey Cumhuriyetî nuştê, vizêr zî Licê, Farqîn, Misêbîn û Cizîr di dikanî nêabî labelê cayanê bînan di abî. Nuştîşê Cumhuriyetî gore, Misêbîn di heyani sernewe dikanî padaye manenî.

Vizêr Erxenî (Erqenî) û Pîran di zî dikanî padîyay.

Diyarbekir di ewro zaf serd niyo, nemrayî ya. Teber ra tanî rotoxî nandê xwi dim a geyrenî, 'erebanê destan (el arabasi) ser o zerzewat, firtiqalan, sayan, lîmonan, silqan, bastêx û gozan roşenî. Tanî dikandarî zî helaw û şîrnawo bîn roşenî. Seki (zeki) vanî bastêx ra bastêxê Gêlî (Eğil), helaw ra helawa Şernexî (Mazıdağı) hewl a, vengani a.

Şaristan di tanî 'emeley zî nimaj bi nimaj tanî cayanê boylikerdan di vîndenî. Inî 'emeleyan miyan di ge-ge pêşmergey (Kurdê Iraqî) zî asenî. Kamî rî 'emeley lazim bîy, jînî gêno beno. Xalibi zî pêşmergan benî ki xwi rê bê nefeqe nêmanî. Hewawo ki vanî, çîyo ki dewletî dana pêşmergan, dey rî nêvejeno. Şar vano "Cêkû ki inî pêşmergey amey, erja (qiyetê) 'emeleyey kewta".

'Emeleyan gore, îdarey kar-keranê ki daîran di xebitênî yan zî îdarey ma'muran tikêna baş o, qe nêbo yew karê jîniyo

Mahmut Alınakî kursiyê Mecisî di qalî kerd, va "Yew mensûbê PKK û yew esker Qars di kişiyay, wîrdî zî insanê ma yî". Inî qalan ra pey Meb'usê DYP (Doğru Yol Partisi) yê Isparta, Ertekin Durutürk şî zorî reydi Mahmut Alınakî kursi ra ard war. Serekê Meclisî Yıldırım Avcı'y zî va "Wextê to qediyewo, ez qala to birnena." Mahmut Alınakî ra ver qalîkerdoxan pê-runî wextê xwi des-vîst deqîqa wextê xwi viyarnabi, labelê Serekê Meclisî jînî rî îdare kerdî. Mi se'etê xwi reydi taqîb kerdî. Inka Diyarbekir di qalî qala Mahmut Alınakî ya. Şar vano "Eki Meclis di zî nê-verdî kê qalî bikî, wa meb'usî ca verdî bîrî. Dêmekî Meclisê Tirkan birayey nêwazeno." Tanî zî vanî "Ay meb'usê ki Kurd î, kam partî di benî wa bibî, semedê protestokerdişî ra heqê jey ki partîyanê xwi ra îstîfa bikî."

Vatişanê ma'luman gore, 26. 12. 1991 di yew ma'lumo Bursayîj semedo ki Lîseya Diyarbekir di telebey teşwîqê boykotî kerdî, tepîşiyawo. Tehqî-qatê yê qereqol di beno. Walî o wezîfe ra zî gîrewto.

Milleti dana-gêna vana "Xwi rî inka yew herbo daxiliyo îlannêkerde esto. Berbatey qirriki di ya. Labelê inawa şêro qet rind nêbeno. Hinî Tirkî û Kurdî yewbînan kişenî. Halbîko her di kıştî zî Bisilmane yî, gunek o."

29. 12. 1992

Eyro varan vareno, mehlayanê kinarîyan di çamur zaf o.

Hewawo ki gazetey Cumhuriyetî eyro nuseno, Licê, Çinar, Erxenî, Pîran, Bismil,

(hûmar: 11) gore:

-Qetlî'amê Licê û Pasûrî di 16 tenî kişiyay.

-Wan, Bulanik (qezayê Mûşî yo) û Norşîn (qezayê Bedlîsî yo) di, 26. 12. 1991 di dikanî nêabî.

-Tanî cayan di polîsan pey çakuçan, zorî reydi berê dikanan şikîti û akerdî.

-Semedê padayîşê dikanan ra Diyarbekir di 200 kes gîriya (tepişiya).

-Ziyaret (nehiyey Mûşî yo) û Yaygın di zî di rojî dikanî gîriyay.

-Kampa PKK ya ki eskeranê Tirkîye bombardiman kerdî, çekê kimyewî zî erziyaybî ser. Di teyaran ra bombey vîstîni kampi ser, yew teyara ra zî eskeran çekî kampi ra naynî. Semedê aya ra gerillayan ra 12 tenî kişiyay.

30. 12. 1991

Gazetey Cumhuriyetî eyro nuseno vano "Vizêr Bedlîs, Cizîr, Misric, Şernex (Mazıdağı) û Silopî di dikanî gîriyay. Inî cayan di daru (ilac) peyda nêbeno."

Raşt a zur a ez nêzana labelê hewawo ki milleti miyan di vajiyêno, cinaza Wedat Aydınî ra pey nîzdî 5000 ciwan vejîyawo koyan (şîyo gerillayan hetî). Inî ciwanan vato "Madem ki hukmat ma keye ra beno bê-tehqîqat û bêpersayîş kişen0, wa hinî ma rê keye di vindertîş heram bo."

ROJNAME Û ZAZAKÎ

31. 12. 1992

Bi name bê "Rojname" yew gazetewo Kurdî Estambul di vejîya. Heyanî eyro mi da-vîst mêrdiman di qalî kerd. Se ra se vanî "Vejiyayîşê inî gazetî çiyêdo zaf baş o". Qal qala inî

arêkerdax: Malmîsanîj

FOLKLORE MA RA
ÇEND NUMUNEY

JN Weşanên Jina Nû

Eke to no kitab
nêwendo, biwane!

Adres
Jina Nû
Box: 30
740 22 Bålinge/SWEDEN

Armanca Guhertî

Min hejmara we ya nuh xwend. Berê hatibû behskirin ku hûnê **Armanca** buguhe- rin. Min jî bi niyeta **Armanca** guhertî pê- şî li kapaxa wê mêze kir. Hin guhertin çê- bûne. Lê bi min piçekî sipî hatiye. Nuha ez rûpela yekê yek diqel- lînim. Rûpelên 2'an û 3'an pirr baş in, bêh- na rojnamevaniyê jê tê, rûpela 4'an ne xer- ab e, ya 5'an pirr dirêj e, ez nikarim bixwi- nim, 6 û 7 baş in, rûpela çirokê baş e û çirokek xweş e. 9 pir baş e, rûpela 10'an ku bi **Dimiliye**, gelo ma hun nikarin carna re- sim jî tê de bi kar binin û piçekî mezin binivîsinin ku em bi- karibin bi rehetî Di- mili jî bixwinin. Rû- pela 12'an bi min pir baş e.

Ez ji we dipirsim we çî bi serê **Hindik û Rindik** da anî, qey

Zinarê Xamo bi mektûba xwendeva- neki quncikê xwe girt. Ma gava xwende- vanek rexneyekê li quncikekî **Armanca** bigre hûnê wî quncikî rakin. Wê wextê eger hûn hewqasî guh di- din xwendevanên xwe ji kerema xwe ra wan nivîsên pirr dirêj ên **Armanca** û wan xebe- rên ne aktuel in ra- kin.

Bi a min **Armanca** pirr baş bûye, qunci- kên **Armanca** wek gu- lûn nav baxçeyan, di nav **Armanca** da ve- bûne. Lê we yek ji wan gulan çilmisandiye ku ew jî **Hindik û Rin- dik** e.

Ez hêvîdar im hû- nê di kar û barên xwe de bi serkevin. Silav li we gişan.

Muzeyyen/Stokholm

Bi hilbijartinê...

Li ser pirseke rojname- van M. Barzanî got ku; "Bila PKK li ser axa xwe têkoşinê bide, em bi vî hawî li ser axa xwe cî na- din wan, eger ew têkoşîna siyasî bidin, axa me ji wan re serbest e." Barzanî di civîna çapemenî de jî bi Kurdî axaft û tercûman ax- aftinên wî wegerandin Tirkî.

Piştî 4 rojên seredana xwe ya Tirkîyê M. Barzanî çû Îngilistanê. Li Londonê ew bi Serokwezîrê Îngilîs- tanê **John Major** re, bi **Prences Elizabet** re, bi **Wezîrê Karûbarê Derve Duaglus Hurd** re û bi **Serokê Partiya Karkir ya Îngilistanê Neil Kinnock** re rûnişt.

John Major di qebûl- kirina Mesûd Barzanî de got ku; "Di hilbijartina Kurdistanê Iraqê de ku di 3'ê Nisanê de çêdibe, miletê Kurd çî qerarê bigre emê wê qerarê nas bikin û emê pişt- giriyê bikin".

Mesûd Barzanî piştî rû- niştinên xwe resepsiyonek da sefirên welatên Ewropa- yê.

Serokê Partiya De- mokrat a Kurdistanê jî Londonê hereketî Fransayê kir. Ewê li Fransayê bi se- rokkomarê Fransayê Mite-

rand û bi berpirsiyarên hu- kumeta Fransayê re rûnê. Wexta rojname me ket çapê ziyareta M. Barzanî ya Fransayê dom dikir.

Ev cara pêşîn e ku M. Barzanî li dervayê welêt û bi resmî bi berpirsiyarên

dewletên Ewropayê re rû- dine.

Bi taybetî piştî stendina qerara hilbijartinê rûmeta serokên Kurdistanê Iraqê li welatên Ewropayê hîn jî zêde bû.

□

PÊNCÊMÎN SALVEGERA ŞEHÎDBÛNA HEVAL SOFÎ

Li newrozên, li biharan
Çend xos çibit welatê min
Devî û çiya dol û newalêt kûr û bilind
Dêmen xwê geş dîkin her dibîşkurin, digel kwêstanû keviyêt befrê
Digel qib qiba kewan, cot hevalîniya refêt qumriyan
Lê li bihara evê salê sala 1987 ê cemrêt ax û avê neketin,
Bihar tev rewş ma li vî warî, gul û nêrgîz û beybûn nebişkuvîn,
Çiya û zozan ne xemilîn ji ber şînî û ta'ziya te, tevde bûn zamar û girî ji ber xenezî û nemerdiya leşkerê Romê.

Em di pêncemîn salvegera şehîdbûna hevalê xwe yê çeleng û nemir- da rêz û giramiyên xwe diyar dîkin, xebat û têkoşîna wî ji xwe re di- kin rêber.

Bi navê komeka hevalan
H. Kardox

Dawiya terora...

Hin mesûlên eskerî bi renekişkê dibêjin "bu- harê emê Kurdan qir bi- kin." Tîrsa gel ew e ku dewlet bi rastî jî haziriya qetlîamek mezin dike. Çimkî di van rojên dawiyê

de dewletê eskerekî mezin kişandiye Kurdistanê û ge- lek "tedbîrên" eskerî digre. Û gava sebebên van tedbî- rên eskerî ji wan tê pirsîn, dibêjin "Kurd di meha Ada-

rê de di dema pîrozkirina Newrozê de wê serî hildin, tedbîrên me li hember vê se- rihildanê ye. Wer xuya ye dewlet dixwaze ji êrîşa xwe re hin sebebên bibîne.

□

Kerro û Kulik

Destpêk r.8

diêşe.
Ez li bextê birê xwe ketime
tu yê dezgîna Bîlêcana
ku hewqa me ji bonê şer ki- riye, bide zendê birê xwe bavê pêş e.
Mefera birayê te tenê li meydanê mabû xalê me yê di şewêş e.
Wî wî wî... wî wî wî wî wî wî wî...
Wî wî wî wî wî wî wî wî...

Kerro vir de wir de wan bir û anî çend çerexiyan li dora wan avêt, wan li pey xwe kaşî ciyê bilind kir û xwe bi gurikî li nav wan da. Wî du hebê din jî ji wan kuşt, ma yek xalekî wî. Kulik bala xwe dayê na tu fela- ta wî yê din jî ji destê Kerro nabe, hingê ew rabû ser darê rimê û hêdî hêdî tewand.

Haaaa... hîîîî...
Kerro birawoo tu rabe dilê min jî di dila re gelekî dîn e.
Serê dilê min bikul e na hey- ra binê dilê min bi birin e.
Xwedê ji Emer Axayê apê me nexweş be,
lê çewa xwarza bi ser xalan ve dişîne.

Tu bidî xatirê Xwedê û pêx- emberan,
tu xalê me yê -Xwedê zane- piçûk nekuje,
diya me ji maciriyê ve ji wan qetiyaye,
qet nebe ap û ajara (azbat) mala xalê me neqelîne.
Bira xalê me yê piçûk li ber bîhna diya me bimîne.
Hey wî wî... wî wî wî wî wî wî wî...
Wî wî wî wî wî wî wî wî...

Kulik didomîne:
Kerro birawoo dilê min divê

ye sed û bîst caran dilê min divê ye.
Tu rabe tabûtekê ji min re çêke ji dara vê biyê ye.
Qatek (bedlek) kiras û derpiyê sipî li min ke,
min bide ser -Xwedê zane- şewitiya Zozikê ye.
Tu berê me bide, emê herin malê ye.
Gava pîra diya me bê pêşiyê ye.

Wê ba lêxe, kefen bi ser min de bibe û bête.
Ewê hingê bête "evya gotina Kulikê Silivîn e,
nexwe dinya a weha tê wê weha ji bête.
Wî wî wî... wî wî wî wî wî wî wî...
Wî wî wî... de wî wî wî... wî wî wî...

Kerro rabû çardarek da çêkirin, taximek kiras û der- piyê fiq sipî li Kulikê bira kir û wî dani ser piştî Zozikê. Hey- amê ew gihîştin serê, ka gund yan bajarê xwe, Kerro di alîkî de çû û Zozikê tevî Kulik jî di aliyê din de şand. Dema Werdekê bi wan dihişê û tê pêşiya wan Kulik li wir nabîne. Ew jî dûr ve qir dike:

-Kerro lawo ka Kulik?
-Dayê Kulik di rîya wî alî de tê.

Axir cîrok e, ne min dîtiye û ne hûn bawer bikin. Lê dibêjin: "Hingê dengê diya Kulik di- keve guhê wî û Xwedê jî hê emanetê xwe jê distîne". Gava Werdekê çardara Kulik û wî di wî halî de dibîne, bi qayde hirça bi birin baz dide pêşiyê. Ew nêzikayî tê de dide, dîna xwe didê ku ba lê dixê vî alî û

wî alî kiras û derpê dibe û tîne. Wê gavê Werdekê dibêje:
Hayhooo... evya tembiha Ku- likê Silivîn e.
Nexwe cîhan a weha hatiye wê a weha ji here.
Werdê dest bi gerandinê dike hem dibêje û hem jî di- bilîne:
Kerro lo loo... heg e dilê min heg e hey lo lo lawo heg e dilê min heg e(2).

Ax Xwedê dizane Kulikê min li meydanê quncikê şek e, kerî tu piştî jê re veke.
Hey wî wî... ax hey wî wî hey wî wî... şêrên min nezan in hey wî wî hey wî wî... de hey wî wî wî...

Kerro: -Dayê han e bi min han e erê dayê han e bi min han e

Ax tu yê bes e li min xe van tanê di giran e.
Min êêê... kevirê çeqmeqa li te aniye pozê biran e.
Min êêê... yekî hiştiye seba loman e.

Eva wesiyeta Kulikê bira ruhniya di çavan e.
Bira kes nebêje "Werdeka de bê Xwedî ye na Welle bê Xwedan e.
Hey wî wî... ax hey wî wî... hey wî wî...


Perişanê û Kulik li vê cîhanê bi miradê xwe şa nebûn. Em hêvîdar in ku li wê dinyayê ew bigihîjin miradê xwe.

(1) Ev rêz û ya li pey ji dengê Kurdên Rewanê hatiye girtin.
(2) Ev rêzên jêrin, ta dawîya kilamê ji benedekê Kurdên Rewanê (Eriwan) hatine girtin. Ew di şerîta bingehîn de tunene.

□

X a ç e p i r s

Amadekar: S. Rêving



Çeperast: 1.a- Navê yekem kovara bi Kurdî ya bi tîpên latînî ku di gulana 1932'an de ji aliye Celadet Bedirxan ve hatiye derxiş- tin. b- Navê listikeke Kurdî ku bi 32 berikan tê listin. 2.a- peyva Şertê, bi gotina wê mirov şertekî dibêje. b- pronavekî kesî c- Ciyoke- ke (hevmane) "ma", "gelo" 3.a- kesê bi emir, ixtiyar (berezavî) b- Navê pincare- kê ku nexwarinbar e, mirov wê naxwin, lê dewar dix- win. 4.a- Balam, feqet, we- lakîn. b- darên ji bo şewi- tandinê. 5.a- Jan, nexweşî b- Mêrê diya mirov 6.a- Bi soranî serhildan b- Navê qe- zayeke Hekariyê ku dikeve ser sînorê Kurdistanê başûr û Tirkînan navê wê kiriye "Çukurca" 7.a- renek b- Kesê ji eşîra "berazan" ku li Kurdistanê Sûriyê dijî (berezavî) 8.a- Navekî ku- ran b- pronavekî îşaretê

9.a- Ciyoka (hevmane) ard, genimê hêrayî b- tayek ji pûrtê laşê mirov (berezavî) 10.a- Kesê ku li ber aş dimîne (berezavî) b- Hurriy- et, serbestî 11.a- Erdê bi av, erdê ne bejî(berezavî) b- Li devera Behdînan ji wê dolabê re dibêjin ya ku ji bo derbasbûna çemên mezin bi xalatan bi her du aliyên ve hatiye girêdan, meqerey- ek li ser e û ji texteyan cihê rûniştinê çêkirine, mirov lê siwar dibe û bi kişandina

Bersîva hejmara berê

Çeperast: 1-a) Mamoste, b) êvar 2-a) îsal, b) amade, 3-a) qad, b) eyaz, c) ref, 4-a) dema, b) aşik, 5-a) Amed, b) tc, c) ekis, 6-a) das, b) aram, c) rî, 7-a) mf, b) trof, c) avis, 8-a) sed, b) alan, 9-a) teyrûlûr, 10-a) hm, b) Azerî, 11-a) ber, b) baw, 12-a) Bedirxan, b) na

Serejêr: 1-a) Miqdatmîthed, 2-a) asa, b) maf, c) em, 3-a) maddes, b) sy, c) te, 4-a) ol, b) ad, c) term, 5-a) em, b) arûd, c) bi, 6-a) tiyatro, b) rext 7-a) caf, b) rx, 8-a) aza, b) ala, 9-a) êm, b) şe, c) alûz, 10-a) varik, b) vareb, 11-a) adekirin, b) ran, 12-a) ref, b) sis, c) hîwa.

şelîtan derbasî aliye din dibe. 12.a- înad, acizî(bere- vajî) b- Navê eşîrekê ku hem li Kurdistanê Iraqê û hem li Kurdistanê Sûriyê dijî.

Serejêr: 1.a-Navê baja- rekî li Kurdistanê başûr ku jê re "Erbîl" jî tê gotin b- Navê pereyê Iraqê (berezavî) 2.a- Dewarek (berezavî) b- Navê nexweşiyêke giran 3.a- Haletê emir ji lêkera 'Hatin'. b- terş, kewal, navê giştî yê berx, mî, karik û bizinan. c- Mêrê diya yekî (berezavî) 4.a- Kesê ji qew- mê 'Ariyan' b- Landik, mehdik 5.a- Organeke laşê mirov b- hazir 6.a- Pirsek (berezavî) 7.a- Navê mêşa ku her tim bi laşê bizinan ve dizeliqe b- vexwarineke serekî 8.a- Ciyokeke (hev- mane) na, ne, yan jî bi ma- neya 'êdî bes e', 'êdî hew...' (berezavî) b- Ava li bihiştê 9.a- Bi soranî 'can, ruh'. b- Organeke laşê mirov ku mirov pê dibîne c- Xwelî, ax. 10.a- Berxikê du salî, yan berxikê ku cara duyem liva wî hatiye birin. 11.a- Karê ku mirov ji bo wex- tekî sînorkirî û bi pereyekî diyarkirî digre. b- Navê pêxemberê filehan 12.a- Hejmarek b- Ji kesê zalim re tê gotin c- du herfên bê- deng.

Pêşgotinek

Celadet Bedirxan

Celadet Bedirxan ev meqala xwe ya jêrîn di sala 1932'an de nivîsiye. Her çiqas di ser vî tarîxê re 60 sal derbas bûbe jî munaqeseyên li ser alfabe hê jî berdewam in. Di bawerîya ku ev meqale wê fêdeyekê bigihîne van munaqeseyan, em wê jî nûve çap dîm.

Kitêbxana Hawarê kitêba xwe a dudowan belav kir. Ji ber ko pêşgotina wê kitêbê ji me re berpêkirina elfabeya Kurdî dide zanin me ew guhastiye hir.

"Bi şeş hejmarên Hawarê ên pêşîn, me hin rûpelên elfabê belav kiri bûn. Bi wan rûpelan me himê Elfabeya Kurdî didan û ji xwenda û zanayên Kurdan, fikrên wan li ser elfabeyê pirsîyar dikirin.

Ji ber wan rûpelan sed û pêncîh dest mabûn. Min dil nekir ko ew rûpelên ha wînda bibin. Min ew dane hev û çend rûpelên din bi ser xistin û pê kitêbokek hate pê. Ev kitêboka ha, bira Elfabeya Kurdî a pêşîn e ko nîfşên dawiyê lê fedkirin û pê bizanin ko pêşiyên wan di çi tuneyîyê de elfabeya pêşîn dabûn çap kirin. Ji bona pêkanîna çermê wê diviya bû ko çend rûpelên din bikevin pêşiyê.

Bi vî hêncetê min dil kir, ji xwendevanên xwe re berpêkirina elfabeya me bi kurtî gilî bikim.

Ev elfabeya hanê ko îro em zimanê xwe pê dinivîsinin paşîya xebateke salinen dirêj e.

Di sala 1919 de, me dabû çiyayên Meletiyê. Em ketibûn nav eşîra Rewan. Mêcer Nowel (Îngilîzek) jî digel me bû. Mêcer zarê nivro dizanî bû, dixebitî ko hîni zarê bakur bibe û ji xwe re her tişt dinivîsandin. Min jî hin medhelok, sitran û çîrok berhev dikirin.

Carinan me li nivîsarên xwe çavên xwe digerrandin, dixwendin û diedildandin. Min bala xwe dida Mecer, bi bilevkirineke biyanî, lê bê dişwarî destnivîsa xwe dixwend, lê belê ez, heta ko min (û,) ji (o,) û (î-) ji (ê-) b. p. derdixistin, diketim ber hezar dişwarî. Ma çima?... ji ber ko Mecer bi herfên latîni, lê min bi herfên Erebi dinivîsandin. Ser vî yekê, di cih de min qerara xwe da û ji xwe re bi herfên latîni elfabeyek lêkani. Êdî minê bikariya destnivîsa xwe paş hezar salî ji bê dişwarî û weke xwe bixwînim, ji ber ko her deng cihê cihê li ser kaxazê dihat sekinandin.

Lewra ko di Elfabeya Latîni de tinê (26) herfên serxwe hene û di zimanê Kurdî de deng ji bîst û şeşan bêtir in. Gelek herfên hevedudanî ketibûn nav elfabeya min; weko: ch, ou, ai....

Ji xwe di zarotiya xwe de, wekê min di dibistanan de dixwend û hîni herfên Erebi û Latîni dibûm, tiştek hebû ko min di çavê xwe ra dikir û ji bona herfên Erebi, di dilê xwe de digot: ev elfabêke welê ye ko dengî dide xwendin ko nayîne nivîsandin û Latîni yekcar vajiyê wê ye, herfin dide nivîsandin ko nayîne xwendin.

Belê fikra min di babeta van her du elfabeyan de ev bû. Bawer bikin bi vî fikra ko min ji zarotiya xwe ve di serê xwe de bixwedî dikir, kêfa min ji

herfên hevedudanî re nedihat.

Hingê ji zimanên ko bi herfên Erebi nayîne nivîsandin min Yûnanî, hînekî Fransîzî û elfabeya Rûsî nas dikirin. Hema di çiyê de, rabûm herçi herfên hevedudanî ji elfabeya xwe derêxistin û li şûna wan ji elfabeya Yûnanî û Rûsî herfinen serxwe êxistin.

Bi vî awayî, min elfabeyek bi sih û şeş herfên serxwe êxistî bû destê xwe.

Wekê em vegeriyar hatin Stenbolê, bi vî elfabeyê û ferhengêke kîçik nivîsand û ji bona çapê kar kiribûn. Lê mixabin ne ew elfabê, ne jî ew ferheng îro ne di destê min de ne. Di sala 1925'a de digel hin nivîsarên min ên din gehîştine heta pêşberê Mehkema Xarpûtê.

Sala 1926 a de, li Almanyayê min careke din çavê xwe li elfabeya xwe gerand, hûr lê mêze kir û mîdeke xweş li ser xebitîm. Min bala xwe dida û didît ko ev sê texlît herf qenc li hev nedihatin, herfên Yûnanî û Rûsî yekrengiya Elfabeyê xirab dikirin. Jû pêve tede du herf hebûn ko ji me re ne gerek bûn. Ji lewra min elfabeya xwe ji nû ve senifand: herfên zêde jê avêtin, hin herfên latîni bilindek li wan bar kirin û di şûna herfên Yûnanî û Rûsî de êxistin. Bi vî awayî elfabêke bi sih û çar herfan û yekreng hate pê.

Ez paşê jî bi elfabeya xwe mijûl dibûm. Lê hetanî ko tirk elfabeya xwe belav kirin, ya me weke xwe dima û tede me tiştekî bîngehî ne diguhart. Min her tiştên xwe pê dinivîsandin û bi nasên xwe dida zanin.

Wekê tirk elfabeya xwe belav kirin me dît ko di dengên hin herfan de elfabeyên me ne mîna hev in. Dengî hebûn ko me nişan kirine, lê bi herfinen din nişan kiribûn.

Herwekî me berê jî çend caran gotibû, ji bona hêsanîkirina xwendina nivîsarên me, ji Kurdmançên Tirkîyê re, me dengên hin herfan bi hev guhertin û herçend hebû me ewçend elfabeya xwe xist nîzingî elfabeya Tirkan.

Ji gotinên jorîn qenc xuya dibe ko elfabeya me paşîya xebateke sêzdeh salî e, gora zimanê Kurdî, gora dengên zimanê me ye. Herê ev elfabe berî sêzdeh salan hatiye nivîsandin û gora zimên û dengên wî hin edîlî û ket halê xwe yê îro.

Berî û piştî belavkirina elfabeyê min fikrên gelek kesan pirsîn û gotinên hinekan bi kêrî min hatin. Di nav wan de mirovine yekcar nexwenda jî hebûn.

Ji lewra ez vî elfabeyê jî keda xwe bêtir keda miletê xwe dihesibînim û pêşkêşî wî dikim.

Ji xwe herçî yê wî ye, ji yê herkesî hêjatir û spehîtir e".

Hawar

Hejmar: 13/ 1932, r:1-2

Kongra 9'mîn ya PDK- Îranê

Kongra 9'an ya Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê ku navê wê kiribûn "**Kongra Şehîd Dr. A. Qasim-lo**", êvara 21'ê meha 12'an dest bi karûbarê xwe kir û kongrê 6 rojan ajot. Di kongrê de gelek mêvan ji hêzên Îranî û ji Kurdistana Iraqê beşdar bûn. Komîta Merkezî ya nuh ku kongra 9'an hilbijartibû bi temamê dangan Dr. Seîd ji bo sekreterîya partiyê hilbijart.

BEROŞ

AŞXANA SERVEKIRÎ



Mahmûd Lewendî

ŞERÊ ABONMAN Û NEABONMANÊN ARMANCÊ

Di şerê **Abonman û Neabonmanên** Armancê de Neabonman bi ser ketin. Sebebê wê jî ji ber ku 152 leşkerên Abonmanan hebûn û Neabonman jî xwediyê 788 leşker bûn û her weha ji dewlet û welatên din jî gelek Neabonmanan alikariya wan dikir.

Do piştî nivro li Meydana Fireh a Stokholmê saet di 10.00'an de, di bin serokatîya **Şakir Abonmanzade û Fettah Neabonmanzade** de şerekî gelek dijar dest pê kir.

Demek e ku serokê Abonmanan; Şakir Abonmanzade bi name, belavok, beyan û di warê psikolojîk de şerê Neabonmanan dikir. Neabonmanan jî bi protestoya bersivnedanê şerê xwe yê li dij Abonmanan didomandin. Lê ev şerê sar do şerê sibê bû

şerekî germ.

Leşkerên Neabonmanan ku 788 kes bûn, bi tang û top û tîfîngên xwe êriş birin ser Abonmanan. Şerê wan sê roj û sê şevan ajot. 152 leşkerên Abonmanan li gel serokên xwe Şakir Abonmanzade her çendî bi awayekî qahremanî li ber xwe dan jî, lê mixabin li hember leşkerên wehş û hov ên Fettah Neabonmanzade deyax nekirin, bi bin ketin. Serok Şakir Abonmanzade jî ji mecbûrî revya. Li gor agahdariyên dawîn, Şakir Abonmanzade bi awayekî illegal dixebite da ku ji nû ve hemû abonmanan bine ba hev û têkoşina xwe ya li dij Neabonmanan bi domînin.

WEXTA KU EZ JÎ AWÛQAT BÛM...

Li buroya awûqat, piştî 15 deqeyan kalorîfêrcî ji abûwat re:

-Kalorîfêra we temam e, êdî ewê baş kar bike, deynê we jî 200 dolar e.

Awûqat metilmayî dimîne û dibêje:

-Ger weha be heqê xebata te ya saetekê dike 800 dolar ku ez bi xwe bi vî awûqatiya xwe nikarim di saetekê de hewqas pere qezenc kim.

Kalorîfêrcî bi dilekî rehet û sakîn weha dibêje:

-Belê welleh heqê te heye, çimkî wexta ku ez awûqat bûm min jî hewqas qezenc nedikir!



JÎ JINA XWE NATIRSE!

Li qahwê yekî jî hevalên xwe re got:

-Yên ku ji jina xwe difirsin bila hemû rabin piya!

Yek ne tê de hemû rabûn piya. Ji yê ranebûyî pirsîn:

-Welê xuya ye ku tenê tu ji jina xwe natirî?

Mêrik:

-Na welle, jînikê vî sibê darek welê li kulêmekê min xistiye ku ji êşa wê ez nikarim rabim ser xwel!



BILA ÇAR PERÇE BE!

Merivêk li aşxanê pizzayekê dixwaze. Pizzacı:

-Ez pizza te bikim çar perçe yan heşt perçe?
-Heşt perçe pirr e ez nikarim bixwim, bila çar perçe be!

DAXWAZA YAHUDÎYEKÎ JI XWEDÊ!

-Hoo Xwedê, daxwaza min ji te bila ez nezewicim. Ger zewicim bila jina min min nexapîne, ger xapand bila haya min

jê nebe, ger haya min jê bû ji bila haya xelkê jê nebe, ger haya xelkê jî jê bû bila ji min re nekin ser hev de, ger bikin jî ez ji xwe re nekim derd!

ne karê aqila ye lê rast e

Amadekar: **Hesen Mizgîn**

* **Planeta Jupiter bi çapa xwe ji dinyê 10 car meztir e û bi 13 hîvên xwe dişibe sistema rojê. Li gor alimên Sovyetî dê Jupiter piştî 3 mîlyon sal ciyê rojê bigre. Jupiter jî gazên hîdrojen û helyûmê pêk tî.**

* Di havîna 1977'an de du keştiyên asûmanê (probe, Îngilîzî), Voyager 1 û Voyager 2 ber bi Jupiter û Saturnê hatin şiyandinê. Ji seyahata ku van du keştiyan dê bike ji re "Seyahata Mezin (The Grand Tour)" tê gotin. Bi vî karî xewnên aliman bi cih hat. Seyahata van keştiyan heya ku gihîştin Jupiter, Saturn û Uranusê 15 sal girt û di vî demê de ji dinê re tim û tim resiman şiyandin. Di sala 1990'î de ev du keştî ji sistema rojê derketin û di tariiya asûmanê de wenda bûn. Li gor hesabên aliman ewê piştî 400.000 sal leqayî stêr-

keke din bibin.

* **Herçiqas çolên Afrika Bakur û daristanên Amerika Başûr jî hev gelek dûr bin jî tiştekî wan ê musterek heye; ew jî toz e. Li gor meteorologên Unîversîta Kalifornî-yayê; ew tozên ku ji Afrika Bakur radibin, piştî 6 000 km firîne dikevin ser daristanên Amerika Başûr.**

* Dema mirov telefonê Tekyoyê dike û dixwaze ji xwe re odekê veqetîne, resepsiyonîstê otêlê te bi rehetî fêr dike. Dataya resepsiyonîst gotinên te raste rast werdigerîne Japonî.

* **Li gor lêkolînerên Îngilîzî kesên desterast jî kesên destêçep dirêjtir dijîn. Li gor encama lêkolînê dema yekî desterast dibe 75 salî yê destêçep di 66 salîya xwe de diçe rehmetê. Lê sebebê vî yekê çiyê hêj nayê zanîn.**

* Aliyê rastê yê laşê mirovî ji aliye çepê niv kilo girantir e. Hestî û kasên alî rastê pir caran ji yê çepê bi qewettir in.